


PolitikART

KOVARA WÊJE HUNER Û RAMANÎ YA 15 ROJÎ

15 Îlon 2018 Şemî

HEJMAR: 248



Çîroka sêlên
ser banên KURDISTANÊ

Li Pakistanê dayikek avê dide delaliya xwe...



Li Vietnamê du zarokên jêhatî masî digirin...



Dîrokçeya berxwedana MED TV

Di vê sohbetê de behsa awakirina televzyonekê hat kirin. Sohbet dûr û dirêj devam kir. Di keliyên sohbetê de behsa navê vê televzyonê jî kirin. Wek henek gotin, em wek TRT a Tirkan, navê KRT lêkin. Û ev sohbet-civîn bi vî rengî belav bû.

► Farûk SAKIK

Yekem televzyona Kurdî û ya Kurdan navê xwe jî yekem şaristaniya Kurdan, ji Medan wergirtibû. MED TV, 2500 sal piştî hilweşîna şaristaniya Medan, dest bi weşana xwe kiribû. Di vî pêvajoya dîrokî de ji bo Kurdan pîrîşt neguheribûn. Kurdistan her di bin dagirkeriyê de bû û Kurd her di nav têkoşîna neteweyî de bûn. Zimanê wan qedexe bû, navê welatê wan tinebû, serok û pêşengên wan yan li zindanan, yan li çiyayan, yan jî li sirgûnê bûn. Yekem weşangeriya televzyona satelîtî ya Kurdan jî bi vî awayî li sirgûnê, li dûrî welêt, li Belçikayê dest pê kir.

Di payiza 1994'an de, li Akademiya Çand û Huner a Kurdan a li bajarê Neussê yê Elmanyayê; jî pêşeng û damezrênerên PKK'ê Mustafa Karasû bi hunermendan re sohbet di kir. Di vî sohbetê de behsa awakirina televzyonekê hat kirin. Sohbet dûr û dirêj devam kir. Di keliyên sohbetê de behsa navê vê televzyonê jî kirin. Wek henek gotin, em wek TRT ya Tirkan, navê KRT lêkin. Û ev sohbet-civîn bi vî rengî belav bû.



18'lona 1996'an dewleta Belçika bi 200 cendirmeyên xwe êriş bir ser zedetirî 20 saziyên Kurdan û 60 kes girtin. Yek ji saziyên dewletê bi ser de girti, MED TV bû. Rojnemaya Azadiya Welat bi manşeta "Icar jî studyoya MED-TV'yê dagir kirin" xwedî li MED TV derketibû.

Li ser vî fikrî bi Ocalan re şewrek çêbû û wî erê kir. Ev nihêrîn li bajarê Bonnê, li komeleyê, bi rewşenbîrên Kurd re hat parvekirin.

Xebatê dest pê kir. Destpêka sala 1995'an jî bo peyka satelîte û lîsansê ketin nav hewldanan. Li Bîrîtanîyayê lîsans wergirtin. Li navekî digeriyan, çend nav hatin pêşniyazkirin lê di dawî de li ser navê MED TV biryar hat dayin.

Di heman demê de li navendeke studyoyan digeriyan. Di demeke wiha de nêzi paytext Brukselê, li bajaroka Vilvoorde studyoyek dîtîn. Avahiyeke biçûk 2 qat û nivî bû. Li qata yekem beşa Soranî li qata duyem jî beşên Kurmancî û Tirkî biçûk bûn.

Li vî derê xebatan dest pê kir. Derfetên wan sî-norkirî bûn. Di weşana ditbarî de Kurd ne xwedî tecrûbeyan bûn. Di destpêkê de bi giranî biyanî hebûn û xebatkarên Kurd jî, li bîrdestê wan perwerde dibûn.

Di destpêkê de li vî studyoyê tenê kompûterek hebû. Bi dorveger dixebitîn. Dîsa jî bo ku di kompûteran de tipên Soranî tinebûn, nûçe bi dest dihatin nivîsandin.

Û ew roj hat...

Ew roja ku herkes li bendê bû hat; di 31'ê Adara 1995'an de televzyoneke nû li medya cihanê zêde bû; MED TV. Êvarê saet di 17:00'an de weşana testê dest pê kir.

Lê roj bi roj hejmara xebatkarên zêde dibû. Rojnemayan û yên bi xwe bawer di karê medyayê de, berê xwe didan vê navendê.

Hatin û li vî derê dest bi perwerdehiya karê televzyonê kirin. Nûçe çawa tên amadekirin, dublaj çawa tê xwendin, pîvanên spikeriyê çi ne... Dîsa gelek kes jî ji bo fêrbûna teknîkê ketin nav hewldanan.

Di 15'ê Gulana 1995'an de derbasî weşana normal ango asayî bûn.

Roj hat, kapasîteya vî avahiye tîrî xebatên televzyonê nekir. Li ser vî yekê li cihekî nû û mezîn geriyan. Di dawiyê de agahiyek wergirtin li Belçika li bajarokê Denderleeuw hin studyoyên ditbariyê hene. Cihekî mezîn e, nêzikî 30 TIR li wî derê xebatên jî bo konserên mezîn û mihîrcanan di-kin. Ew jî li cihekî wiha digeriyan.

Piştî temamkirina karên burokratik, di dawîya sala 1995'an de barkirin û hatin li van studyoyên bajarokê Denderleeuw bi cih bûn.

Efsûna MED TV xeyal vejandin

MED TV wek ruhekî biêfsûn li ser xaka Mezopotamya geriya, çand, folklor, ziman, adet, tore, muzik, stran, çîrok û xeyalên mirovên van zewiyên xemgîn, careke din vejandin.

Lê di ekranên MED TV de, bi gelek ziman û zaravayên ku li dijî zextên dewletên dagirker li ber xwe didan, weşan dihat kirin. Zimanê Kurdî tevî çar zaravayên xwe her şev jî camên televzyonan ber bi hesret û xeyalên Kurdan ê hezaran salan ve diherikî.

Her wiha zimanê Asûrî/Suryaniyan ku di bin heman zex-



MED TV 2'yê Tîrmeha 1996'an bi awayekî fermî û fillî hate girtin. 15'ê Tebaxê jî nû ve dest bi weşana xwe ya asayî kir. Berî girtinê, rojê 6 saet weşan dikir piştî bûyerê weşana xwe kir rojê 8 saet. Rojnemaya Azadiya Welat wî çaxî bi sernivîsa xwe ya "Wê dengê me jî her demê bilintir be!" bi xêrhatina MED TV'yê kiribû.

tan de ye, jî ekranên vî televzyonê digihîşt ser zewiyên ku koka xwe jî distîne.

Zimaneke din, zimanê qewmê Lazan, ew jî ku li Tirkîyeyê qedexe ye; carinan bi stran û kilamên xwe li dijî dijminên mirovahiyê li ser ekranên vî televzyonê derdaketin pêş.

MED TV jî bili van zimanên qedexekirî, her roj di demên cûr bi cûr de bi Tirkî, Erebi û Ingilîzî jî weşan kirin. Kilamên Ermenî, Farişî û gelek zimanên din jî car caran di ekranên vî televzyonê de derketin pêş.

Serketina vî kanala televzyonê belkî jî ew e ku wek dengê Rojhilata Navîn pirrengin û hesreta insanên wê herîma biqêda, hesreta biratî, demokrasi û wekhevîyê di ekranan de be jî anibû ziman.

Her wiha oldarên Isewî, Misilman, Elewî û Êzîdî di rojên xwe yê pîroz de li ser ekranên MED TV civiyan; qesîde û duayên xwe gihandin hemû alemê. Di rojên pîroz ên van komên olî de, şahî û bernamêyên taybet jî hatin pêşkeşkirin.

Hesta netewebûnê bi pêş ket

MED TV jî ber ku bi taybetî jî bo dû gelên bê dewlet, jî bo Kurd û Asûriyan weşan dikir, wek dibistanekî bû. Ev televzyon jî bo her du gelan jî di vî warî de yekemîn derfet bû. Kurd û Asûriyan yekem car bi saya vî televzyonê bi dewlemendî û kûrahîyên nîrxên xwe yê neteweyî hisiyân.

Bi taybetî di nav Kurdan de hesta netewebûnê piştî weşanên MED TV bi awayekî li ber çav bi pêş ket. Kurd bi hevûdin hesiyan, welatê xwe nas kirin, bi hêza xwe hisiyan û dîroka xwe derxistin holê.

MED TV di pêvajoya rizgarbûna Kurdên bindest de bi roleke girîng rabû. Ziman û çanda wan a qedexekirî û veşartî li wan vegehand. Ji hişyarbûna wan a sedan salan re alîkarî kir.

Ji ber vî rola dîrokî MED TV bela û bala dijminên mirovahiyê jî kişand ser xwe. Ew mişkên tariyê, jî bo reşkirina ekranên rengên Mezopotamya cara yekem sala 1995'an ketibûn tevgerê.

Di destpêkê de li vê studyoyê tenê kompûterek hebû. Bi dorveger dixebitîn. Dîsa, ji bo ku di kompûteran de tîpên Soranî tinebûn, nûçe bi dest dihatin nivîsandin.



Dema ku serokê PKK'ê Ocalan bi rêya ekranên MED TV, destê aşîtiyê dirêji dagirkeran dikir û ew vedixwendin agirbestê, rejîma Tirk bi sînyalên dijber ekrana MED TV'yê reş kir.

Erişên ji bo reşkirina ekranên MED TV'yê piştî Cotmeha 1998'an bê navber dewam kir.

Rêvebirên rejîma Tirk, ji ser peyka Turksatê ji Stenbolê sînyal li dijî peyka MED TV rêdikirin û bi vî awayî di fezayê de korsanî dikirin.

Vê jî têrê nedikir, di qada navneteweyî de dest bi xebatên lobiye kiribûn. Berjewendiyên aboriyê yê dewletan wek qoz bi kar dînin.

Ji bo di qada navneteweyî de vê televizyonê krîmînal nişan bide, di warê diplomasîyê de ji dest bi pêngavekê kiribû.

Operasyonên dewleta Tirk

Di 18'ê Adara 1996'an de Brukselê peymanek bi Enqerê

re mohr kir, di vê peymanê de, operasyona li dijî MED TV wek "Operasyona Spûtnîk" hatibû binavkirin.

Vê çaxê hikûmeta Tansu Çiler, desthilatdar bû. Mehmed Agar ji Midurê Ewlehiya Tirk a giştî bû.

Ev peyman ku li Enqerê hatibû îmzekirin, bûbû sedema erîşên li dijî sazîyên Kurdan yê li Ewropayê.


Yek ji hedefên van operasyonan jî MED TV bû.

Dest danin ser peryên şirketa Roj NV ku ji bo MED TV bername amade dikirin.

Dema ku 13 Milyon Mark li Luksembûrg û 5 Milyon Frank jî li Swêdê ji bo kirêya peykan hat razandin, dewletê dest danî ser van peryan û li ser daxwaza dewleta Belçîka ev pere li wê derê hate bilokekirin.

Demekê bi sîn ve, di 16'ê Îlona 1996'an de hedef wê carê studyoyên MED TV yê li navçeya Denderleeuw a nêzî Brukselê bûn.

Di operasyona li hember televizyonên Kurdan de 200 cendirne û polêsên Belçîkî çih girtibû.



Kovara qerfî û wêjeyî Pine û "derdê eyarkirina sêlan"

Gelek xebatkar û mêvanên televizyonê hatibûn binçavkirin. Yê hatin binçavkirin birin navenda cendirmeyan. Ji van kesan 5 rêvebirên televizyonê mehekê girtî man.

Belgeyên ku li Belçîqa bi dest ketibûn, di Hezîrana 1997'an de di rojnemaya De Morgen de hatibûn weşandin. Li gorî îdiayên rojnemayê, plana vê operasyonê li Enqerê hatibû danîn û peyman jî aliyê herdu dewletan ve hatibû îmzekirin.

Dîsa li gorî Rojnemaya De Morgen, ev peyman di 9'ê Tirmehê de di navbera midurê ewlekariya giştî yê Belçîka Willy Darider û Midurê Ewlekariya giştî yê Tirkiyê Alaattin Yüksel de hatibû îmzekirin.

Yekemîn televizyona gelê Kurd bédeng kirin

Piştî erîşê, studyoyên li Denderleuwê nedihatn bikaranîn û Brîtanayê jî lîsansa dayî cemidandibû.

MED TV piştî vê erîşê demekê weşana xwe li studyoyên Swêdê dewam kir.

Doz hat vekirin û li Brîtanîya dihat şopandin. Piştî demekê dirêj, polisê Brîtanîya "Skotland Yard" di 1997'an doza li hember MED TV û Weqfa Çanda Kurd vekiribû, bi awayekî fermî da sekinandin.

Polisê Brîtanîya "Skotland Yard" di sa biryar da ku 13 milyon markê li Luksembûrgê û 5 milyon Frankê li Swêdê ji bo kirêkirina peykê hatibû veqetandin û desteser kiribûn, ji nû ve bidin Weqfa Çanda Kurd.

MED TV piştî vê biryarê careke din li studyoyên xwe yê li Belçîkayê dest bi weşanê kir.

Piştî demekê, ev weşana MED TV dewam kir. Êrîş û hewldanên dewleta Tirk yê ji bo girtina televizyona Kurd jî bêsêkin dewam kir.

Sala 1999'an, vê carê li ser dewleta Brîtanîyayê zext kirin da ku lîsansa MED TV betal bike.

Paşê bi zextên li ser Elmanyayê, Brîtanîya, Lehistan, Spanya, Fransa û Portugalê xwest ku weşana MED TV bide rawestandî. Di Nisana 1999'an de bi komploya navdewletî, pêla erîşa li dijî medya Kurd jî dest pê kir. Komîsyona Serbixwe ya Televizyona Brîtanî (Independent Television Commission ITC) lîsansa MED TV betal kir û weşana wê rawestand.

Di encamê de wê koalîsyona dijberên MED TV di dîroka mirovahiyê de biyareke rûreşiyê mohr kir û yekemîn televizyona gelê Kurd a satelîtî bédeng kirin.



Mahmûd Onder yek ji kedkarên MED TV bû, par rêmet kir

Ji Rindo heta Şaneşînê

► Hingê min got, ez ê bibim listikvanê sinemayê. Illeh sinema û listin. Ji bo min radyo jî televizyon jî hincet bû da ku bikevim sinemayê û bilizim.

MED TV gava dest bi weşana xwe kir, Barzan Şasiwar ew kes bû ku nexasîm jî di bernamaya zarokan de xwe zû bi temaşevanên Kurdiyê da nasîn û hezkirin. Rindoyê wî, tevi min wî jî bîra gelek kesan neçe helbet. Lê nexasîm jî bi serpêhatiya bernamaya Şaneşînê di kanalên televizyonê yên ku wê jî rûesma MED TV'yê hatibin, Barzan çihêkî taybet di bîr û hizra temaşevanên televizyonvaniya Kurdî de çêkîra. Çi çê û çi xirab Barzan Şasiwar ji sala 1995'an ve li pey televizyonvaniya xwe 23 sal hiştin û jixwe jî beriya wê jî serpêhatiya wî ya radyo û dublaja filman jî her hebû. Li ser jiyana xwe jî gundê lê jî dayik bûyî heta studyoyên STÊRK TV yên li Belçikayê wî behsa serpêhatiya xwe kir. Di vê serûvenê de koçberiya ber bi Tehran, Başûrê Kurdistanê, Swêdê û Belçikayê her hene û her xatirxwestinek. Barzan Şasiwar gelekî xema wê dixwe ku bavê ku gelekî dixwest wî li ser ekranên TV'yê bibîne, nekarî wî bibîne. Lê ev xatirxwestin her car ne tenê Barzanê diltenik diêşînin: Sîdar Yigît a ku di bernamaya Rindo de tevi Barzan Şasiwar li studyoyên li Stockholmê bernamaya zarokan çêdikir, gava ku Rindo jê xatirê xwe dixwest û digot ez ê biçim Kurdistanê, a ku kelogirî dibe Sîdar e û ev jî jî bîra Barzan Şasiwar naçe. Bêhtirî 800 bernameyên Şaneşînê, bêhtirî hezar mêvani, helbet rê li ber bûyerên kenê mirovan bînin û giriyê mirovan bînin vekiriyê: Xelil Xemgînê bêriya zeytûnan kiriyê di bernamaya zindî de zeytûnan li ber xwe dibîne, û mêvanekî din ê jî Rojavayê Kurdistanê rastî sansûra civakî tê. Nebêjin sansûra civakî çî ye, çî tişt e, Lewma di sohbeta me de Barzan behsa wê dike û em jî xweş lê serwest dibin.



Luqman GULDIVÊ



Te me qansêr kir Na, te em qansêr kirin

Pêşî Derwêş Remezânê li Garanê hebû

Serpêhatiya Barzan Şasiwar beriya bi 61 salan li gundekî Urmiyê bi navê Dezgîr ku 30-35 kilometroyan dûrî bajêr dest pê dike. Ew lê mikur tê ku beriya çend salan bi gotina dayika xwe pê hisiyaye ku li vî gundî bûye. Pir li wir nemaye: "Zarokatî min li Curne, Garane, Qayêr, Hef-tawa wan gundên wan deveran derbas kiriyê. 12 saliya xwe jî çûme gundê Rajanê. Aliyê me pirr serma ye. Ku-histan e, zivistanan pirr berf lê heye. Li aliya din, ê sinorê Colemêrgê ye. Jiyana xwerû gundewarî bû. Min bi caran gur ditîne ji nêzik ve. Lî cihekî wilo ez bi çirokan mezin bûme. Li gundê Garane Derwêş Remezân hebû, wî çirok digotin, pirr xweş û bi hosteyî"

Hebûna bav li gund, û nebûna wî di salên 60'î de ku pêşmergetî kiriyê jî helbet tesîr li Barzan Şasiwar kirine, lê ev çirok wê tesîreke diyarker li jiyana û xisleta kesayetiya Barzan Şasiwar bikira: "Gava ez mezin bûm, ew şê-waza vegotina min a çirokan min jî wî girt. Mem û Zîn, çirokên Şehzade Bîrahîm û Nûşafêrîn yên Rustem, Bijen û Menice û çirokên zarokan ên bi gur û rovi. Tê bîra min gava ku wî çiroka Mem û Zînê got, babê min girîya, ez jî jî ber babê xwe giriyam. Ew fiksoymên wî digotin, bi dê-wan û filan, haletekî wisa bû ku bi zarokatî min hizir dikir, rast e. Min jî babê xwe re zivistanan digot, min bibe cem Derwêş Remezân da çirokan bibêje. Bavê min ez di-birim. Sobe hil dikir, pirr bi tam hêdî hêdî digot; Şehzade Bîrahîmê min dîtî Nûşafêrîn mewîja reş xwar, di gerdenê re diyar bû."

"Tîştên jî bîra min naçin, yek jî wan jî ew bû, di bernamaya zarokan de, mêvanê min zarokêk bû. Ez jî kukluya Rindo diliznim. Min jê re got, li Rindo binihêre, li min nenihêre. Me dest pê kir, Rindo digotiyê tu sporê dikî, wî got, erê. Rindo gotiyê, tu baz didî, tu li pey çi baz didî? Piçêkî sekinî sekinî, hate bin masê cem min got, Barzan, mirov pey tiştan baz nade, tu çawa pirsê dikî, ez bersiva te nadim, te şaş pirs kiriyê."

Yeka din jî, Sîdarê (Yigît) bernamaya bi Rindo re xilas dikir, wexta xatirê xwe xwestiba, Sîdar pirr hisî, hestiyar, xwişka mezin a Rindo ye, pirr mihbeta wê jî Rindo re

hebû. Min his dikir, gela girî di qirika wê de ye, dixwest bigirî. Ev qet jî bîra min naçe, ji ber ku hem jî bo min pirr zehmet bû, hem jî bo wê.

Yeka din jî me dublaja filma Li Colemêrgê Demsalek dikir. Vê carê, hevaleyê li wê derê bû, wî zen dikir hema wilo bi lez dublaj bike wê xilas bibe, hat lez li min kir. Min jê re got, nabe, hîna nû me zikê xwe tijî birinc û savar kiriyê, divê isrehet bikim, divê xwe jî rola dublajê re hazir bikim.

Aciz bû, got, "Te me qansêr kirî" di nava wî halî de min Kurdiya wî rast kir û got, "Te em qansêr kirin."

Sinemayê xewna wî kir listikvanî

Heta sala 68'ê radyo hîna nû dikeve mala wan, û Barzan Şasiwar wê şanoya radyoyê nas kira. Lê tiştê ku wê jî wî re bibûya xeyalek, wê gava bavê wî dema ku ew 9-10 salî bû li Urmiyê wê bibira sinemayê: "Hingê min got, ez ê bibim listikvanê sinemayê. Illeh sinema û listin. Ji bo min radyo jî televizyon jî hincet bû da ku bikevim sinemê û bilizim."

Barzan Şasiwar ê ku hîna di zarokatîya xwe de tevî bavê xwe stranbêjiya kilamên folklorî kiriyê, piştî balix-bûn û guhertina dengê xwe, êdî ev yek tenê di nav hevalan û jî bo xweşiya dilê xwe kiriyê. Dema sinifa 6'an li gundê Rezge diqedîne, paşê diçe Urmiyeyê û li wir li dibistanê êdî şanoyê dike. Di sinifa 8'an de Qesîsê Mollîer li

bîra wî ye hîna. Meraqa wî ya şanoyê lê gurr dibe. Pê re, pirtûkeke Ezîz Nesîn sala 1971'ê dikire ku pê êdî mîzahê nas dike. Gava ku lîseyê diqedîne li ser parêzgeha Urmiyê koma wî dibe şanoya herî baş a dibistanan û ew jî xelata baştirîn listikvanê şanoyê werdigire. Hasil mala Xwedê ava, ew xwe li dibistana eskerî diceribîne, tevi ku imtîhanan jî derbas dike û dest pê dike, bi hinceta bavê wî pêşmergetî kiriyê, wî jî zaningeha eskerî diavêjin û ev jî dike ku ew berê xwe bide Başûrê Kurdistanê sala 77'an û heta 79'an fêrî Soranî jî dibe. Ha hingê ew dest bi wergera çirokên Ezîz Nesînî ber bi Kurmancî û Soranî ve dike ku di rojname û kovaran de çap dibûn. Li wir bi awayekî profesyonelîtir şanoyê jî dike.

Rêya ber bi Swêdê ve

Piştî hilweşîna rejîma Şahî, ew ê sala 1980'yî biçûya Tehranê 2 salan produktoriya radyo bixwenda û di heman demê de di radyoya Tehranê beşa Kurdî de dest bi kar bikira. Bi giştî 6 salan li wir kar dike. Di nava vî karî de hem tercûmeya ber bi Kurmancî ve û hem dublaja filmekê jî dike sala 1983'yan ku ji bo wê dibêje: "Bi esehî helbet nizanîm, lê ez yek ji wan kesan im ku peşî li ser dublaja Kurmancî kar kiribe."

Lê di dawiyê de lê serwest dibe ku lê ne bawer e ji rejîma nû jî û biryarê dide Îranê biterikîne, pêşî berê xwe dide Bakurê Kurdistanê, paşê Tirkîyeyê û di dawiyê de digihîje Swêdê. Sedem: "Niha ji xisleta min e, tiştê bi serê min nekeve, qebûl nakim." Hasil sala 87'an tê Swêdê û sala 90'î dîsa li karê radyoya Kurdî vedigere. Di heman demê de karê dublaja filmên Kartoon a bi Kurdî jî dike tevî kesên mîna Mahmûd Lewendî.

Di navê de tecrûbeya şanoyê jî dewam dike, ku di listikeke Peter Weiss de ku wergera wê ya Kurdî hatiye kirin, ew listikvanê sereke ye ku wê hefteyekê sala 1990'î yan jî 1991'ê li Stockholmê bê nişandan. Ji wê jî anekdotê wî heye: "Me rehmêtî Mahmûd Bakî jî vexwendibû. Ew û Şivan Perwer bi hev re tîn. Hasil gava erebeya xwe park dikin, kilîta wê tê de şikestibû, tiştêki wisa, ez tam pê nizanîm. Ew pê mijûl bûbûn heta polis tîn filan, wan şanogerî nedît. Paşê ku em derketin me ew di wî halî de dîtin."

Ha wan çaxan, xwedê dizane bi pesnadayîna Mîrhem Yîgît ku bi xwe jî di destpêka MED TV de bernamêçker bû, têkilî bi Barzan Şasiwar re tî danî: "Navê wî bawer dikim Akîf Hesen bû, telefoni min kir û got, em televizyonekê vedikin û li Stockholmê em ê studyo deynin. Bawer bike heta sibehê xew nekete çavên min. Weke ku taze jî dayika xwe bûbim."

Ew ê xelkê bine, ji bo dublajê kar bike, lê bernamêya ku ew pê di bira min de bû, her ew bernamêya zarokan bû: "Kuklaya Rîndo, fikra min bû. Min ew da çêkirin. Min li gel Sîdarê (Yîgît) dest pê kir. Pêşî Nûbihar bû, paşê bû Baxçê Zarokan. Heta sala 1998'an sê salan, hem dengê Rîndo yê min bû, hem me tekst dinivîsandin. Ez bi Sîdarê jî dişewirîm. Me carinan jî me digot, em ê spontan jî bipeyivîn. Me li ser her tiştî li hev dikir û piştê me çêdikir."

Mala me kêfxweş û serbilind bû

Li Urmîyê, xelkê wî, kes û karê wî jî MED TV û jî hebûna dengê Barzan Şasiwar gelo razî bûn: "Gelekî kêfxweş bûn, ji ber ku ew şêwazê axaftna min a weke, eeerê bixwe jî ya Urmîyê bû. Hindek çirokên weke Şengê û Pengê ew jî ji cem me bûn. Mala me gelekî kêf xweş bû. Mixabin babê min nebihist. Babê di radyoyê de dengê min bihist, jî xweşiya difirîya. Carinan di zarokatiyê de hinan tan didan babê min digotin, ew qeşmer e, lê babê min destê xwe li piştê min dida û digot, na, ew babê min e, ew hunermend e. Min pîrr dixwest babê min bibihîse û bibîne (li vir ditlenik dibe û digirî). Babê min nedît mixabin. Dayika min, birayê min, mala min gelekî kêfxweş bûbûn, digotin, em bi te serbilind in, hasil pê şabûn. Digotin, te timî digot sîneme, film, tu gihiştî ya xwe. Di zaroktiyê de nav li pey min xistibûn, digotin, Barzan li sînemê radize. Paşê, xelkê, hinakan navê dikanên xwe danibûn Şaneşîn (berna-



Dikaneke navê "Şaneşîn" lê kirî li gundê Rajan

meya ku wê destpêka 1997'an wî pêşkêş bikira). "

Xelkê ku bi Şaneşînê debara xwe kirî

Ji bo bernamêya Şaneşînê, Barzan Şasiwar behsa çirokeke balkêş dike: "Xelkê dema bernamê dihat weşandin, dîtira rojê bernamê kopî dikir, zêde dikir û difirotin. Ji ber ku bernamê du zimani bû hem Kurmancî û hem Soranî, jî Sine, Urmîye, Kirmanşan hema seranserê Rojhilat ev dikirin. Gelekan jî min re gotiye li me negire, me bernamêyên te kopîkirine û firotime û debara xwe pê kiriyê."

Tevî ku ev bernamê jî Barzan Şasiwar re bûye nasnameyê jî ew lê mikur tî ku ew ne jî bo bernamê çêkeriyê çûbû televizyonê, lê derdê wî huner û listikvanî bûye: "Min dixwest huner bikim, bi Rîndo jî bi Hindikî lê Rîndikî jî. Derdê min ne televizyon bû, min dixwest şano û listikvanîyê bikim. Lê êdî bernamê jî bi erêkirîna wan kesên ku ji vî karî fêr dikin jî, êdî li ser min ma. Hê bernamêya Şaneşînê dest pê nekiribû, min Hindikî lê Rîndikî hinekî nivîsi. Ecibandin û di MED TV de piştî nûçeyan hat nişandan. Paşê gotin, tu tiştêki muzikê jî çêke, jixwe tu bi herdu zarawayan jî dizanî. Me projeyê nivîsî û min tî de got, sert e ez Hindikî lê Rîndikî jî biêxim nava bernamêyê de. Berî her tiştî çavê min li temaşevanên min bû. Min destpêkê du mêvan anin, yekê/î kurmançixêv û yekê/î soranixêv. Me mîzah bi Soranî li gel Ferheng Mihemed ku hîna jî li televizyonê ye û Kurmancî jî tevî Kerîmo, Selamo û gelek kesên din bûn. Sala 1996'an gava hatim Belçîka, û bi ser televizyonê de girtin, ez jî birim. Di çanteyê min de jî çend bernamêyên Hindikî lê Rîndikî hebûn ku min anibûn nişan bidim. Ji ber wê me sala 1996'an nekarî dest pê bikin. Hasil 14'ê Çileyê sala 1997'an yekemîn bernamê zindî hat weşandin."

Xelî Xemgîn û zeytûn

Barzan Şaswar ku çend caran dersên televizyonvanîyê jî dîtine, bi xwe bawer û bi bawerîya bi wî tî, yekser dest bi bernamêya zindî bike jî, wiha li ecemîtiya xwe mikur tî: "Di bernamêya zindî de gelek telefon dihatin. Tiştê ecêb Luqman, li şûna ez berê xwe bidim kamerayê min berê xwe dida ezman. De ne, deng jî jor dihat. Ji rejîyê di guhê min de digotin, kuro berê xwe bide kamera, çîma tu berê xwe didî ezman! Xalê Osman, Saman Sabûncî bû Kamiran Nozhatzade bû, Kawa Akreyî bû, kameraman bûn di bernamêya pêşî de. Di deng de Hesenê me hebû. Mêvan jî Xelî Xemgîn bû û kungfukerê bi navê Helmet bû."

Ji bo ecibandina bernamêyê jî Barzan hinekî xwe li nefsiçûkiyê datîne û dibêje, "Şensê min hebû. Bernamêya pêşî bi wî rengî bû. Reqîb nebûn. Xelkê telefon dikir bernamêyê digot, em pîroz dikin gelekî profesyonel e. Ejer Şexo ku niha bixwe bernamêçêker e, hingê me hev nas nedikir, wî jî telefon kir û got profesyonel e, pîroz dikim. Çend tişt tî de bûn, Hindikî lê Rîndikî hebû. Min jî xelkê pirsibû, Şaneşîn yanî çî, Xelî Xemgîn kî ye, û bersivê wan weşandin. Çar, pênc paketên wisa bûn. Wekî din jî tî bîra min min jî Xelî Xemgîn re got, tu jî Efrînê yî, tu bêriya çî dikî? Wî got, zeytûn. Min got, ez zeytûnan bidim de tu wê bixwî? Got, erê. Min jî zeytûn li bin maseyê danibûn. Hema min derxist û danî ber

wî, min got, de bixwe! Wî xwar û got, yê Efrînê ne."

Qederê 22 salan û bêhtîrî 800 bernamêyî

Çend tiştên wiha ku min jî televizyonên din jî dîtibûn, cihê xwe girtin. Wekî din sê kategori hebûn: Kategoriyeke li ser wan kesan bû ku navê wan, hunera wan hebû û di nav xelkê de dihatin nasîn lê ne sax bûn, rehmêt kiribûn; yê weke Hesenê Cizîrî, Mihemed Arîfê Cizîrî, Miradê Kinê, Hesen Zîrek û bi dehan, me bernamê li ser wan çêdikir. Ev kategoriyeke bû. Kategoriya din jî ew kes bûn ku dengê wan dihat naskirin, xelkê navê wan jî bihiştibû, lê reng nedîtibûn. Weke Nasir Rezazî, Necmedîn Xulamî, endamên Koma Berxwedanê û gelekên din. Kategoriya sîsiyê ew kes bûn ku stran gotibûn helbet, lê di televizyonê de hatin naskirin, hem deng, hem reng û hem nav; weke Çopî û gelek ciwanan û dengbêjan. Heta 2012'an Şaneşîn li studiyoyê Çêbû. Heta niha di qederê 22 salan de bêhtîrî 800 bernamêyî çêbûn. Muhtemelen jî tevî 4-5 stranên serê bernamêyê, em behsa bêhtîrî 4 hezar stranên dikin. Heta 2011'ê Hindikî lê Rîndikî jî her gav ya Şaneşînê bû. Piştê ez çûm cihê cihê geriyam û min bernamê çêkir, mesela çûm Îsrailê, Azerbaycan, Gurcistan, Ermenistan, Bakurê Kurdistanê, Anatoliya Navîn, Rojavayê Kurdistanê û Başûrê Kurdistanê û li ser sînor jî bi Kurdên li Rojhilat re jî min bernamê çêkirin. Ev heta niha jî dewam dike."

Çiroka destwerdaneke îstîsna

Heta 2012'an jî teqrîben 650 bernamêyên Hindikî lê Rîndikî tevî Kerîmo, Selamo û Ferheng Mihemed karîne çêke. Ji bo rehetîya mêvanên xwe jî wî xwe rehet dikir: Beriya bernamêyê isrehet dikir û illeh spor dikir, lewma "Gava ez rehet bûm, mêvan jî rehet bûn û bernamê jî serketî bû. Min ew hazir dikirin. Min digot, tu serketî bi ez jî serketî me. Mesela kesekî strana hinekên din gotibe jî bi awayekî pîrr muhremane min digot, erê ew strana tu dibêji, gelo filan kes jî negotîye meselen. Me alikariya hev dikir. Rostanê min destane dikirin. Min jî alikarên xwe re digot, pîrgîrêkek hebe, mesele heqrêya mêvanan jî neyê jî min re beriya bernamêyê nebêjin, paşê bibêjin, yan na wê tesirê li min bike. Di hin haletên gelekî teybet ên îstisnayîde min piçekî lê dida ji bo stresê kêmtir bike. Belkî salê du caran. Sîra rehetîya mêvanên min rehetîya min bû."

Lê Barzan Şasiwar dibêje, ew di bernamêyên xwe de serbest bû, mêvanên xwe jî serbest dibijartin, ji bilî çend îstisnayîyên li derveyî studiyoyê amadekirî jî mudaxelîyê mêvanên wî nehatîye kirin. Helbet ku em rawestandina Hindikî lê Rîndikî a salekê nehesibînin. Lê ew behsa bûyereke taybet dike ku êdî mirov dikare jê re bibêje destwerdaneke jî derve, jî xelkê di nava rêxistina rizgarîxwaz a Rojava de, angoo ne destwerdaneke jî nava saziya MED TV'yê bi xwe: "MED TV bû, mêvaneke min jî ji Rojavayê Kurdistanê bû. Min ew da nasîn. Piştê ez pê re peyivim beşa pêşî bû, piştê min ê yê soranixêv bîniya û jî bo wê min got, tu isrehetekê bike, paşê ez ê te dîsa vexwînim. Êdî, di wê navê de jî Rojava xelkê jî nava rêxistina Têvgera Azadiya Kurd telefon dikir, digot, ev zîlamê hanê nebaş e, jî gel re gelek mişkile çêkirine. Xulase, ew venegeriya studiyoyê. Di beşa yekê de stranên xwe gotin, di beşa diduyê de min pine mîne kirin, weke ku tiştê nebûbe."

Telefonî min kir û got,
em televizyonekê vedikin û li
Stockholmê em ê studyo deynin.
Bawer bike heta sibehê xew nekete
çavên min. Weke ku taze
jî dayika xwe bûbim.

Ew nûçe ya rojnameya Selam kin û tije pirsên bêbersiv bû, lê wisa xweş û girîng bû ku biqasî çendîn mehan di rêza yekê ya axaftinên xelkê yên rojane de bû. Destpêka jiyaneke bû û di havîneke germ de aveke sar bû ku têhniya sedan salan a axeke birîndar dişkand.



MED TV bi Kurmancî, Soranî û Tirkî nûçeyên rojane pêşqêş dikirin.

Rola MED TV di prosesa netewebûnê de

Pêngavên yekê kengî, çima, li kû û bi çi armancan tene avêtin? Îmkanên demê yên diravî, siyasî û me'newî di çi astê de bûn? Gotin li kû, ji bo çi û kengî tene gotin? Û dema em gelek pirsyarên din yên wiha ji xwe bipirsîn yan ji li bersiva wan bigerin, belkî hingî em qîmeta karê MED TV û kedkarên doza wê şoreşê baştir analiz bikin. Her wiha bir û ramanên serkêşên rêxistineke siyasî ên pêşketinxwaziye ji yê bi zelalî ji me re xuya bibin. MED TV çi da Kurdan û doza mirovahiye? Çima çêbû û destketên wê çend alî ne? Ez ê di wê nivîsê de hemû hewla xwe bidim ku bibime bersiva van pirsyan.



Kakşar OREMAR

Her pêngavek li gor imkan û mercên dema xwe, buha, nasname û girîngiya xwe dide xuyani kirin. Salên 90'î yên sedsala derbasbûyî ye. Radio û TV'yên herîmî hê ji li pirraniya welatên cihanê tene guhdarî û temaşe kirin. Şoreşeke hemû alî û nû ya teknolojîyê di halê xwe yê pêşketin û berfirehbûnê de ye. Ji wir û şûn ve, edî hinek ci-vaknas cihanê bi "gundeke biçûk" dişibînin ku her kes wê ji wir û pê ve bêhtir ji berê agahdarî raweşa jiyana hev û cihana derdora xwe be. Ragehandin bi rêya teknîkeke modern û nû şax û likên xwe ber bi hemû aliyên jiyane ve ber dide. Kurd ji li gor derefetên xwe sûdê jê werdigirin.

Ji 1884'an heta 1900'an ku di "Kongreya Navneteweyî ya Elektrîstê li Paris" navê TV anku Television hate diyarkirin, ji salên 1960'an û şûn ve weke amrazekî nava malê kete baza welatên Rohhilata Navîn ji. Sal bi sal teknîka wê ber bi pêş ve

çû û îro di jiyane de xwedî rolekî sereke ye.

MED TV: Desthilata Kurdan a esmanî

Wê salê ez li Rohhilatê Kurdistanê, li bajarê Urmiyê bûm. Di gelek rojnameyên Farsi yên sala 1995'an xeber kurt û tenê çend der bûn: "Rawestgeheke televiziyonî a satalayt û navneteweyî bi hebûna çendîn studyoyên kar li London, Belçîka û welatên din yên Ewropayê ya Kurdî dest bi kar kir..."

Ew nûçe ya rojnameya Selam kin û tije pirsên bêbersiv bû, lê wisa xweş û girîng bû ku biqasî çendîn mehan di rêza yekê ya axaftinên xelkê yên rojane de bû. Destpêka jiyaneke bû û di havîneke germ de aveke sar bû ku têhniya sedan salan a axeke birîndar dişkand.

Roja 15'ê Gulana sala 1995'an çapemeniya Kurdî li hemû Kurdistanê dest bi pêngaveke din a nûtir kir. Wê rojê weşanê bi awayê zindî li Londonê dest pê kir û biqasî şexs saetan tirêjên roja xwe dane nava dil û jiyana Kurdan. Beriya destpêkirina weşanê, kampanyayên rêşkirinê li dijî MED TV dest pê kiribûn. Zextên dewleta Tirkîyê bêsînor bûn, pîrî caran ji bi awayekî fermî ji dewletên Ewropî daxwaza wan hebû ku nehêlin TV'yeke Kurdî dest bi weşana satalaytî bike, lê tevî hemû hewldanên berfireh wan nekarî di hilanina wê pêngavê de Kurdan paşqez bikin. Edî çeperekî nû yê bihêz li dijî siyaseta înkâr û hebûnê hatibû vekirin.

Logoya rengîn!

MED TV bi wê logoya xwe ya rengîn, reng ji rengên ax, tav û sirûştê Kurdistanê, bi wê muzîka balkêş û hişyarker tevî cîngila xwe a kurt ku çav bêliv û lebat li ser diman, qet û qet ji bira min naçe. Rûberê ku MED TV dabû ber xwe, pir berfi-

reh û ji Ewropa bigire heta bi bakurê Afrîkayê û Rohhilata Navîn bû. Ronahî û ekrana wê ya tije rengên delal, cidiyeta pêş-qêşvanên wê, deng û rengê hunermendên herî bi nav û deng tevî kincên wan ên rengîn, siyasethanên xweşnav, kesayetiyên Kurdistanî û seranas, dirokzanên ku me tenê navê wan bihiştibû û hinek berhemên wan xwendibûn, rojnamevanên ku bihiştina deng û şîroveyan wan hesreta hezaran kesan bû, û hwd... Me tev cara yekê bi rêya MED TV ew dîtin û nas kirin. Ew pêngav bo dema xwe şoreşeke modern bû. Qêrînen fetisandî ên netewekê ku heta vir bi "ked, berxwedan, serhildan û xwîne" li ser piyên xwe rawestiyabû. Pêngava herî girîng û pêwîst ji bo destpêka jiyaneke nû ku pê re destketiyên mezin ji yek li pey a din hatin. MED TV bû.

MED TV bi qasî şoreşa yekê ya Pişesaziye li Ingilistanê gûherandinên mezin di civaka Kurdistanê de pêk anîn. Şoreşa Pişesaziye di nivê sedsala 18'an de li welatê Ingilistanê dest pê kir û hingî gûherandinên bîngehin di warên îndustirî, çandî, hilberîn, anîn û birinê de çêkirin.

Şoreşa duyê di sedsala 19'an de ji du destketên mezin di pêşketina zêdetir a karê çandî û elektronîkê de, bûn sedem ku Ingilistan weke welatê yekê yê pişesaziye li cihanê nav derxîne. Hilberîn pêwîstiya wê şoreşê bû û ev ji bû sedem ku di gelek waran de zanyarên mezin ji zaningehên wî welatî û welatên din yên Ewropayê derkevin. Wê şoreşê destketên negatîf ên weke çêkirina çekên teqandinê û kuştinê ji bi xwe re anîn û, wê ew kirin pareke cudanebûyî a jiyana xelkê; lê belê şoreşa Kurdan a di qada ragehandinê de heta destketekê tenê ya negatîf ji bi xwe re neanibû. MED TV bûbû hêza deng, nasname, hebûn û xebata Kurdên hemû Kurdistanê. Çavên xelkê vebûbûn û bêhtir bi nihîniyên jiyane dihesiyan.

MED TV bi wê logoya xwe ya rengîn, reng ji rengên ax, tav û sirûştê Kurdistanê, bi wê muzîka balkêş û hişyarker tevî cîngila xwe a kurt ku çav bêliv û lebat li ser diman, qet û qet ji bira min naçe.

MED TV bûbû hêza deng, nasname, hebûn û xebata Kurdên hemû Kurdistanê. Çavên xelkê vebûbûn û bêhtir bi nihîniyên jiyane dihesiyan.

Hêştta jî li bîra min e, çaxê ku yekemîn car ronahiya ekranên MED TV bû sedema hatina hêsirên şahî û kêfxweşiyê. Êdî bi jidayikbûna vê kanala bihagiran re Kurdan pencereyeke nû ber bi cihanê ve vekiribû ku him bi zimanê wan yê zikmakî bû û him jî dawî bi birçîbûna Kurdan a di qada çandî de anîbû.



Bi hatina MED TV re sînorên me'newî di nava Kurdan de neman. Sînorên siyasî û destçêkirî jî di çavê Kurdan de bêttîbar bûn û leqîn an jî hejî-neke bihêz kete kursiya hakimên wan dewletên totalîter ku li dijî "pêşketin û azadiya beyanê" bûn.

Milyaran gotin bi qasî niv kiriyarê jî xwedî bûha ninin...

Kesî destê birêveberên PKK'ê negirtibû û hevkarî nedabû wan, lê hevî jî bo pêşketinê jî li cem wan xerib nebûn. Rêzdar Abdullah Ocalan bêttir jî hemû dewlet û zilhezên biyanî bawerî bi hêz û îradeya gelê xwe anîbû. Li ser bişkîvîna kesayetiya şikestî û sivikbûyî ya Kurdan, xwedî nihêrîn û rêbazên taybetî yê çareseriyê bû. Wî baş dizanî ka Kurd jî kîjan bilindahiyê hatine berjêkirin û dizanî jî ka yê careke din çawa wê bejina bilind a hatiye çemandin li hemberî dijminên doza mirovahiyê rake ser piyan. Wî got û tevî hevalên xwe yê fedakar jî gotin birin serî. Ew û hevalên xwe neçar bûn ku kar bikin û bi imkan û hêza gelê xwe, wîha bangî civakê dikirin: "Qehreman ew kes e yê ku pirsgirê-kekê çareser bike. Bila baweriya we bi hêza we hebe. Şoreşger ew kes in ên ku doza xwe binasin û berî her kesî/ê piştta wan bi hêz û îradeya gelê wan germ be. Kes jî me re karekî nake, divê em bixwe ji bo peydekirina dermanê derdên xwe tevgerê bikin. Em jî ti kesî kêmîtir an jî bilindtir ninin, lê em dikarin qedera xwe bigûherin..."

Naveroka benameyên MED TV

Hunermend, stranbêj û dengbêjên me bi: "Sonda me, axa me ye" awaz û newayên xwe ên şiyarkirinê jî dîr ve belavî nava gel li Kurdistanê kirin. Peyamên wan salan dermanê wan derdên bêderman bû ku li pey derbasbûna salên dirêj li ser hev kom bûbûn.

Denbêjên efsaneyî: Şakiro, Karapêtê Xaço, Şeroyê Biro, Reşîdê Baso bi kobra xwe ya bilind behsa mîrxasî û çelengiya jinên Kurd dikirin. Ji hêla din jî ew ekrana nasandina dirok û serbîhûriya lîder û şervanên serhildanên Agirî, Urmîyê, Mehabad, Amed, Silêmanî, Oremar, Barzan,

Koçgirî û birîna kûr a Kurdistanê Sor bû. Qazî û Simko, Şêx Seîd û Seyîd Rîza, Bedirxanî û Şemzîni, Şêx Mehmedê Berzencî û Şêx Ehmedê Barzanî, Sûnnî û Şîî, Êzîdî û Yarsan, Kurmanc û Soran, Lek û Zaza, jêr û jor, rast û çep a erdnigariya Kurdistanê û hwd, mijarên benameyên MED TV'yê bûn ku bo cara yekê silaveke cuda jî hemû silavên beriya xwe dabû gelê Kurd.

Peyamên siyasî û şiyarkirina civakê carinan bi rêya panel, hevpeyvin, belgefilm û carinan jî hinek stranbêjên weke ên nava Koma Berxwedan, Şivan Perwer, Cîwan Haco, Şehribana Kurdî, Merziye Ferîqî, Nasir Rezaî, Aram Tîgran, Bîrader Muksî û gelekên din didan. Yanî wan bi rêya huner, xebata siyasî jî kir. Şoreşgerên Kurdistanê, zemînê siyasî jî serhildaneke bêsinor re amade kiribûn. Êdî bi hatina MED TV re barekî giran li ser milê kadroyên wê şoreşê rabûbû û belkî mînakên li jêr bêttir wê bi merema min bihesînin:

Stranên weke ya jêr ku Şehribana Kurdî bi rapêça xwe ya Kurdewarî, metanet û giraniya xwe, saz di dest de û tevî orkestrayê mezin, heyecaneke zêde di ruhê temaşavanan de çêdikir:

*Her çar tixûbên Kurdistan hatin neyar
Beranberê şerê giran em dikin şer
Ev der welatê me Kurdan e, em naçin der
Ev der welatê şêra ye, em naçin der*

Hozan Şemdin bi dengê xwe yê nazik û Serhedî hat û behsa qehremaniya Bavê Edo kir:

*Were wilololo... wî babo
Wîla Mîro babê Edo siwarê bozek yektaye
Şad û şihûdê Babê Edo gelek in, gelek hene
Babê Edo ketiye pêşiya eskerê Romê şer dike
Bona xîret û namûsa Kurdaye
Were nemînim nemînim nemîn, nemînim maqûlo li
dunyayê*

Mihemed Şêxo bi hemû hesretên xwe yê ku bi bejna xwe ya mîna çinara bilind birin bi axa sar, bi dengekî melûl û tije xem behsa gula xwe dikir:

*Rengê te yî pir delalî, bilbil li ser te dinalî
Te nebinim bi vî halî, amanc û kedera min î
Gulê kesk û sor û zer e, nîşana alê li ser e*

Yên ku ketin bîra avakirina TV'yekê ku navê yekemîn Împeratorî yan jî dewleta Kurdan li sala 612'ê beriya zayînê li ser be, ne Xweda bûn ne qehreman, lê ew kesên dûrbîn û afirandkar bûn ku ketibûne ser rêya doza azadiya bi milyonan mirovên ku weke herkesî jî azadî, serxwebûn û wekhevîyê hez dikirin. Wan dikir ku neteweyek xwedî dirokeke çend hezar salî bi mafên xwe yê meşrû û rewşa bihese. Ew mirovên pîrr bextewer bûn ku dema ditin imkanên guherandinê hene, guhdarî li ti kesî nekirin û rûpelekî nû di diroka Kurdistanê de vekirin. Pêngava MED TV bi serê xwe şoreşeke mezin û pêwîstiyê demê bû ku asoyên nihêrîna neteweyêke dêrîn li cihanê berfirehtir kirin. Fedakarî jî wê mezintir nabe ku kes yan jî rêxistineke siyasî-civakî jî pileya sifirê bê û di dirêjahîya temenekî ne zêde dirêj de dest bi avakirina sîwaneke nû ya vehesînê bike. Fêkiyê wê xebatê hema zû kete ser zarê xelkê û jî wan re bû dezgeheke nû ya tije ronahiya jiyandê. Bixwebawerî û îrade bûn ku ew kes jî yê beriya xwe cuda kiribûn.

Encamên şoreşa pişesaziyezî reng û rûyê cihanê gûherîn, lê jî zarokên 14 salî bigire heta mirovên mezin jî gund û bajarên ketin fabrikayên hilberînê, keda wan kete berîka çend kesan û çinên civakê jî hev û din dîr kirin. Gund û sîrûşt wêran bûn. Rewşa seqayê gûherî û nexwendewarî, nexweşiyên derûnî û zêdebûna êşên din jî pê re afirîn, lê bi hatina MED TV re sînorên me'newî di nava Kurdan de neman. Sînorên siyasî û destçêkirî jî di çavê Kurdan de bêttîbar bûn û leqîn an jî hejîneke bihêz kete kursiya hakimên wan dewletên totalîter ku li dijî "pêşketin û azadiya beyanê" bûn. Ji ber wê jî hêmayê herî bihêz yê herekata siyasî li Kurdistanê mezin kete bakurê Kurdistanê.

Bawerî bi hêz û îradeya gelê xwe anîbû
Bizava gel û bêttir girêdana çiya, bajar, gund, şervan û gerilayên doza azadiyê bi rêya wê desthilatê ve çêbû ku Kurdan ne li erdê belkî li esmanan çêkiribû.

Hikûmeta ku Kurdan li esmanê Rojhilata Navîn li dijî dagirkerên welatê xwe saz kiribû, êdî bi leşkerekîşî û fermanên hovane nedikarin jî holê rabin. Vê carê, hêza Kurdan a sîd-wergirtina jî teknolojiyê bû ku hemû rê li ber "hevalbendên tarîti û reşahiyez" girtibûn.

Xebateke wiha tenê di berjewendiya partî an jî rêxistineke diyar de nebû, belkî teşwîqek bû ku ew rê bête berfêrkirin. Li vir bû ku gotineke bav-kal an jî ya pêşiyên me hate bîra min: "Hezar gotin û kiriyarek...""*lê ez dibêjim: "Bi*

...
 Ay lê gulê gula minê, şîrina li ber dilê minê, delal li ber dilê minê
 Ez gulê nadim bi malê dinê, ez ber gulê tîm kuştinê

Xelil Xemgîn bi dengê xwe yê germ û îstisna wiha qêriyabû:

*Îro çexa şoreşê fireh dîgerîne
 Li qadên cihanê deng dilerzîne
 Destarê proleter hûr dîherîne
 Kedxwarî û nokeran ji qada hiltîne
 Tovê jîyanê reşandin, li qadan şin didan
 ... Rabûn ser piyanî, jin dan Kurdistan...*

Hingî carna bi dîtina van dimênên han, hêsrên kêfxweşiyê dîhatin xwarê û carna jî êşên bindestiyê bûn ku axin dixistin nava ruhê mirovan. Kela dilan bi rondikên çavan vedîhesî. Her kes li rêyêke çareseriyê digeriya û keç û xortan berê xwe dida çiyayên Kurdistanê.

Di gelek warên siyasî, hunerî û civakî de reqabê û şerê kar û afirandinê kete navbera rêxistin, siyasêtan û hunermedên Kurd. Ev rengê kêbirkiyê jî xwedî xereke pirali bû û hemû aliyan jîyanê li Kurdistanê ber bi pêş ve dibirin.

Nav û nasnameya hunermedên navdar kete arşîva meji û ruhê me: Mihemed Arif Cizîrî, Evdalê Zeynikê, Şeroyê Biro, Zadinê Şakir, Hesen Cizîrî, Meryem Xan, Nesrîn Şerwan, Tahir Toftîq, Hesen Zîrek, Şakiro, Eyşe Şan û yênan mayîn xemil û rewşa hunerê me a dewlemend bêhtir bi me dan nasandin. Hereketa PKK'ê qîmetekî bêsinor dida aliyan çanda Kurdan a jî rêûresmê û ev jî bû sedema bipêşketina huner û dengbêjiya Kurdî.

Ew salên tije şer û şoreşê, bi van peyamên wiha re bûn salên ku gelê Kurd amade dikirin ku dîsa hinek pêngavên din yê pêşdeçûyîna jî hilînin.

Xweşiya bihara sala 1995'an!

Di nivê salên 1990'î de bihara sala 1995'an jî hemû biharên beriya xwe xweştir bû. Xebata jî bo avakirina maleke wiha çend sal bû dest pêkiribû, lê dema ku kadroyên PKK'ê di nava gel de digeriyan û digotin: "Amadekariyên ji bo TV yêke satalîtê tîne kirin..." , hinek kes hebûn

Pêwîst e, ev rastî jî ji bîra dîrokê neçe ku MED TV yekemîn televîzyona Kurdî a satalîtî bû ku beriya sê dewletên dagirker, Îran, Sûriye û Îraqê dest bi weşana xwe kiribû.

ku bi henek li peyama wiha fêm dikirin, bawer nedikirin û heta dikenyan jî. Ji ber ku hingî heta gelek dewlet jî ji ber kêmbûna îmkânên diravi di fikra birêxistina saziyêke wiha mezin de nebûn. Jixwe, dewletên ku xwedî desthilateke diktatorane bûn, heta xewna avêtina pêngavên wiha jî nediditîn. Ew gotin kete kirasê kiryarê û me zani ku xewn nîne. Hêştê jî li bîra min e, çaxê ku yekemîn car ronahiya ekranên MED TV bû sedema hatina hêsrên şahî û kêfxweşiyê. Êdi bi jidayikbûna vê kanala bihagiran re Kurdan pencereyêke nû ber bi cihanê ve vekiribû ku him bi zîmanê wan yê zîmkakî bû û him jî dawî bi birçibûna Kurdan a di qada çandî de anîbû.

Pêkhatina arşîveke neteweyî

Bernameyên MED TV li ser gelek mijarên jî hev cuda bûne arşîveke me ya ku bi bandora xwe ya bi hêz, qet nayê jîbirkin. MED TV di civaka Kurd de zû cihê TV'yên Tirkî, Farsî û Erebi tije kir û bû çira û ronahiya malên Kurdên Kurdistan û derveyî welêt. Bi ser hev de weşana wê bi zîmanên: Kurdî, Ingilîzî, Erebi, Sîryanî û Tirkî demokratîkbûna hizr û ramanên birêveberên şoreşa Kurdistanê didan xuyakirin. Hêzeke mezin a fikrekî felsefî li piştê birêvebirina wê TV'yê hebû ku yekemîn car bû ekranên wê bi ewqas dewlemendiyan zîmanî re derkeve pêş. Wehşeta ku bi vê pêngavê re di dil û serê rayedarên dewleta Tirkîyeyê de çêbûbû, me bi gelek rastiyên din ên piştê perde dîhesîne. Êdi wan bi gotinên weke: " *Dehrîk, tevîhevî yan jî teşwîqa dijberên me, jî bo xerakari, teror û şerê çekdari li dijî me bi rêya MED TV yê û divê ew kanal bê girtin*", li dijî destketên Kurdan dest bi şerêkî pirali kir. MED TV bûbû berbenda herî bihêz li dijî siyaseta wan a asimilasyonê ku Kemalîstan bi avakirina komarê re dabû destpêkirin. Ji hêla din jî bi nêzî hev kirina hemû zaravên zîmanê Kurdî (Kurmançî, Soranî, Kelhurî, Hewramî, Kirdîkî/ Kirmancî yan jî Zazakî) yekîtiyêke neteweyî ya bihêzrî dabû destpêkirin.

Mozaikeke rengin jî bernamêyên hunerî, siyasî, civakî, nûçe, şano û jî bo zarokan jî himê mala Kurdan a nûavakirî MED TV bû. Ew ekran êdi serûkanî cihê baweriyê li derveyî Kurdistanê bû ku hemû pilanên sansûra dewletên weke Îran,

Hikûmeta ku Kurdan li esmanê Rojhilata Navîn li dijî dagirkerên welatê xwe saz kiribû, êdi bi leşkerkêşî û fermayên hovane nedikarîn ji holê rabin. Vê carê, hêza Kurdan a sûdwegirtina jî teknolojiyê bû ku hemû rê li ber "hevalbendên tarîfî û reşahiye" girtibûn.

Sûriye, Iraq û bi taybetî jî Tirkîyeyê pûç kiribûn. Kurdan ew weke sefirî aşî û demokrasiyê lê dewleta Tirkîyê jî weke herikîna bayê tofanekê li dijî xwe bi nav dikir.

Rabûna sinorên me'newî

Rakirina sinorên me'newî pêngava yekê bû ku bi damezirandina MED TV re weke "damezirandina dewleta Kurdistanê li esmanan" jî dikare bê wesf kirin. Pira veguhastina deng û rengê Kurdan li derve û nava Kurdistanê mezin cara yekê bi rêya MED TV çêbû. Em bi hebûna hezaran belgeyên li ser vê gotinê şahidê vê rastiyê ne jî ku ji bihara sala 1995'an heta 1999'an pêngava MED TV bû "destpêka ronesansê hemû alî di ragihandina Kurdî" de. Wê helbet geşkirina agirê ragehandinê li welatêkî weke Kurdistanê yê guherandinê siyasî, civakî, dîrokî û me'newî jî bi xwe re bine ku her yek jî wan mijareke serbixwe ya lêkolînê ne. Pêwîst e, ev rastî jî ji bîra dîrokê neçe ku MED TV yekemîn televîzyona Kurdî a satalîtî bû ku beriya sê dewletên dagirker, Îran, Sûriye û Îraqê dest bi weşana xwe kiribû. Di çend pêvajoyên geşkirin û jidayikbûna ragehandina Kurdî de MED TV destpêka demê nû ye ku mixabin di dîroka ragihandina Kurdî û biranînê jî bo salroja jidayikbûna yekemîn rojnâmeya Kurdî a sala 1898'an** carna bi berfirehî behs li ser nayê kirin yan jî bi zanebûn qîmeta wê nayê nirxandin. Hinek nivîskar, sosyolog û lêkolîvanên biyanî destbikarkirina MED TV weke "Pûçkirina peymanên Sykes-Picot û Lozanê" bi nav dikin.

Sala 1995'an kirêkirina satalîtê jî bo weşandina bernamêyên Kurdî, karekî hêsan nebû. Çimkî him gelek giran û heta gelek dewletên cihanê xwedî wê budce û hêza madî nebûn ku li şirketêke Ewropî ya satalîtan heta bo dema saetekê jî li ser sîstemê analog dest bi weşanê bikin. Birêveberên hereketa Partiya Karkerên Kurdistanê zû zanîn ku dem demê nû ya ragihandina gerdûnî ye ku pê re dunya weke gundekî biçûk jî hatibû bi nav kirin. Wan bi wêrekî biryar da ku bi rêya bikaranîna teknolojiyê li dijî dijminên doza Kurd û Kurdistanê jî sûtê ji îmkânên heyî wergirin. Ew biryar, hingî kete piratîkê ku "kirîza azadiya raderbirin û ramanê" li pîranyaya welatên Rojhilata Navîn û Kurdistanê hebû, lê hingî birêz Ocalan bi îsraake pîr zêde gotibû: "... bila zarokên Kurd çavê xwe bi filmên Kurdî vekin û li berê raneke Kurdî jî bikevin xewa şîrîn..."

Rakirina sinorên me'newî pêngava yekê bû ku bi damezirandina MED TV re weke "damezirandina dewleta Kurdistanê li esmanan" jî dikare bê wesf kirin.



"Karê Bêkaran" yek ji bernamêyên mîzaha siyasî ya MED TV bû ku heftane bi skêçên xwe temaşevan dikenandin.

Êdî li pey çar salên ku MED TV'yê reng û rûyê jiyana civakê gûheribû, Kurdan nedikari bê TV bijîn. Bi tefandina ronahiya ekranên MED TV'yê re, vê carê li Hezîrana sala 1999'an MEDYA TV vebû û di heman rêya MED TV'yê de dest bi meşa xwe kir.



Giringiya hebûn û destpêkirina kanaleke wiha, hingî eşkere bû ku dewleta Tirkîyeyê bi hemû hêz û imkanên xwe yê aborî û diplomatîk kete şer û hêrîşên li dijî çalakiyên MED TV'yê. Êdî ji wir û bi şûn ve hevdîtînen wan bi rayedarên pîrraniya dewletên Ewropî re merdar bûn. Bi taybetî jî bi dewletên weke Fransa, Elmanya, Belçîka, Britanya, Danîmarka re şert û mercên wan ew bûn ku *"rê li ber weşandina satelîtî a TV ya rêxistinêke terorîstî bigirin û nehêlin PKK li welatê wan xwedî çalaki be"*.

Hemû hewldanên wan yê bêrawestan bûn sedem ku di Nîsana sala 1999'an de li gel bidawîbûna cezayê 21 rojan yê reşkirina ekrana MED TV, piştê bi yekcarî lîsansa wê jî hêla ITC*** ve bê girtin. Di êvara heman rojê de polis bi ser studyoyên MED TV yê li welatê Belçîka de jî girt. Ji wê rojê û pê ve, êdî dawî bi weşana yekemîn TV ya Kurdî ya satelîtî hat.

Ew dem roj û salên pîrr hestiyar bûn ku dîroka Kurdan a azadîxwaziye tê re derbas dibû. Li hemû cihanê rûheki nû ketibû ber bizava siyasî ya Kurd û giraniya barekî wiha jî li pey Başûr û Rojhilatê Êdî ketibû ser milên Kurdên Bakurê Kurdistanê. Li pey şiyarî û xebateke berfireh a siyasî-çêkdarî Êdî dem dema diyarkirina qedere bû. Di bilindkirina hestên neteweyî û xwenaskirinê de rola MED TV'yê bi qasî sed salan hereketa siyasî li Kurdistanê bi giştî û bi taybetî li Bakurê Kurdistanê ber bi pêş ve biribû. Ji ber wê jî çî li nava Kurdistanê çî jî li Tirkîyê astengiyên jî bo temaşekirina MED TV rêbaza yekê a leşker û berpîrsên dewleta Tirkîyeyê bû ku dane destpêkirin. Li Îran û rojhilatê Kurdistanê jî tevî ku temaşekirina hemû TV'yên satelîtî qedexe bû, dema ku dizanînin kes û malbat li MED TV temaşe dikin, cezayê wê pênc caran zêdetir jî temaşekirina TV'yên din bû.

Li pey MED TV'yê

Hemû armanc fetisandina deng û xelaskirina bizava siyasî a Kurd li tevahiya Kurdistanê û bi taybetî jî li Bakurê Kurdistanê bû. Armanc fetisandina wê dengê ku ji bo aşî, demokrasî û azadiyê bû. Li pey revandina serokê giştîyê PKK'ê, rêzdar Abdullah Ocalan, girtina MED TV'yê hingî bi awayekî cidî kete nava planên yekê jî yên rayedarên dewleta Tirkîyeyê ku Kurdên hemû dinyayê li dijî wê kiriyara terorîstî ketin nava kuçe û kolanên hemû bajarên Kurdistan, Ewropa û welatên din yê ku Kurd li wan hebûn. Hevalbendên Tirkîyeyê di NATO û eniya aboriyê de hemû cûreyên hevkarîyê danê ku bi yekcarî agirê şoreşa Kurdis-

Rola MED TV'yê ya dîrokî di meydana netewebûn û bihêzkirina hestên neteweyî de nayê inkarkirin. Di prosesa bêhtir xwenaskirin û netewesaziyê de Kurd û rêxistinên me yê siyasî bi qasî dîrokekê deyndarên MED TV'yê ne.

tanê bitemirîne. Girtina MED TV'yê li pey revandina rêzdar Ocalan dewama komplokeyê bû ku heta roja îro jî dewam dike. Lê Êdî li pey çar salên ku MED TV'yê reng û rûyê jiyana civakê gûheribû, Kurdan nedikari bê TV bijîn. Bi tefandina ronahiya ekranên MED TV'yê re, vê carê li Hezîrana sala 1999'an MEDYA TV vebû û di heman rêya MED TV'yê de dest bi meşa xwe kir. Pêwîst e ku bê zanin ku hema li pey girtina MED TV'yê, di demê kurt de CTV cihê wê tije kir û berê temaşevanên xwe wergerande ser wê ekranê ku bi awayê test, bernamêyên xwe belav dikirin. CTV li rex bernamêyên hunerî û wêjeyî nûçeyên rojê jî belav dikirin. MEDYA TV heta sala 2004'an dewam kir û karî jî xwe re cihêki taybet di nava Kurdan de çêke. Şikayet û dan-standînen dewleta Tirkîyeyê bûn sedem ku li Fransa lîsansa wê jî bê betalkirin û di sa hêrîşî studyoyên TV'yê li bajarokê Denderleuw (Belçîka) kirin. Li gel xisareke mezin a teknîkî, vê carê jî ROJ TV hate meydana ragihandina Kurdî û bêhtir jî berê karî bala pîrraniya gel li Kurdistan û derveyî welêt bikîşîne ser ekranên xwe. MEZOPOTAMYA TV'yê jî gelek valatîyên wan TV'yên girtî tîjî kirin û weke kanaleke serbixwe bernamêyên çandî, muzîk û dîrokî belav dikirin. Destpêka sala 2012'an lîsansa ROJ TV jî ku li welatê Danîmarka bû, hate betalkirin.

Bi vekirina kanalên nû re Êdî dewleta Tirk, hevalbendên wan yê ku qadên siyasî û aborî pêhesiyar ku Kurd wê dest jî geşkirina vê doza şoreşgerî a ragihandinê bermedin. STÊRK TV, NÛÇE TV, MED MUZİK, ARYEN TV, ART1, KANAL 10, ÇIRA TV, RONAHÎ TV û yê mayîn yek li pey a din hatin û meydana ragihandina Kurdî a esmanî berfirehtir kirin. Êdî bi jidayîkbûna MED TV'yê re li başûr jî liv û lebateke nû di vî warî de dest pê kir û KURDISTAN TV (1999), KURDSAT TV (2000), GELÎ KURDISTAN TV (2001), NEWROZ TV (2007), NRT TV (2010), KNN (2008), RÛDAW TV (2013), K.24 (2016) û bi dehan kanalên din asta ragihandina Kurdî ya çar

parçeyî ber bi standardbûneke cihanî ve birin. Îro di nava TV'yên Kurdan de gelek kanalên baş hene ku bûne sedema pêşketina ziman, bazara karê ragehandinê, naskirina Kurdan, rêbaza siyasî û asta rewşenbîriya civakê jî bi rêjeyeke bilind hatiye gûherandin. Rêya ku bi kedeke mezin, imkanên diravî yê kêm û xerckirina hêzeke pîrr zêde bûbû xêza şopa MED TV ya dîrokî, îro jî bi rêya dehan kanalên din dewam dike.

Rexne û daxwaz

BBC ji sala 1922'yan ve bi dirûşma: *"Divê her neteweyek di nava aşî û asayîşê de bi neteweke din re bixavê"*, karê xwe da destpêkirin. CNN'ê jî ji sala 1980'yî û pê ve bûye navendeke giring a belavkirina nûçeyên herî aktu-ell li cihanê. Weke minak li vir tenê behsa wan du navendên ragehandinê dikim ku berê bi imkanên ne zêde berfireh dest bi karê xwe kirin, lê îro jî BBC bi sedan şax û likên xwe û gelek zimanên zindî li hemû cihanê çend milyar muxatebên xwe hene. BBC weke *"navend an jî Radio û TV ya dayik"* hêsta jî bi hemû hêza xwe dixwaze pêngavên pêşketinê bavêje. Helbet dewlet û imkanên diravî-teknîkî yê mezin li piştê vê projeya mezin bûne. Lê belê nabe em *"MED TV"* weke TV'ya dayik a ragihandina Kurdî bibînin û rexneyên xwe nenivîsin. Li pey derbasbûna salên dirêj pêdivî bû ku şopa MED TV niha xwedî dewlemendiyan mezintir, temaşavanên zêdetir û saziyên berfirehtir bûya.

Bi van minakên jor re Êdî rola MED TV'yê ya dîrokî di meydana netewebûn û bihêzkirina hestên neteweyî de nayê inkarkirin. Di prosesa bêhtir xwenaskirin û netewesaziyê de Kurd û rêxistinên me yê siyasî bi qasî dîrokekê deyndarên MED TV'yê ne. Hunermendên weke Aram Tigran, Nasir û Merziye Rezazî jî qedirnasiya xwe bi stranên li ser rola MED TV'yê dane diyarkirin.

**Yanî hezar gotin bêkiryar nagehîjin kiriyarekê. Anku kar û piratik jî axaftin û gotinên vala bihagirantir in.*
*** Rojnameya KURDISTAN a ku 22'yê Nîsana sala 1898'an nemir Miqdad Midhet Bedirxan li bajarê Qahîreyê da weşandin. Wê bizavê piştê li bajarên weke Urmiyê, Stembol, Şam, Hewlêr û Mehabadê jî bi belavkirina kovar, rojname, mehname û avakirina komele û xwendîngehên Kurdî jî her carê bi awayekî kirasê xwe nû dikir.*
**** Independent Television Commission: Komîsyona Televîzyonê a Serbî xwe ya Britani.*

Lêkolînên wêjeya Kurdî li Kafkasyayê

● Her çiqasî em Êzîdîyan weke civaka ku Kurdiya herî dewlemend û zelal bi kar tîne dihesibînin jî, esas em tenê vê civakê folklorîze dikin. Ne tenê folklorîzekirin, lê her wiha nihêrîneke bakur-navendî jî di hişmendîya xwe de ava dikin.

● Bêqîmetbûna pirtûkan, dizîna wan yan jî frotina arşîvan her pirsgirêkên sereke ne. Lê her wiha pirsgirêkeke din jî dezgeheke Kurdan ku van arşîv û pirtûkxaneyan li hev bicivîne, biparêze û jî lêkolîneran re veke jî nîne.

L i Bakurê Kurdistanê, di van çend salên dawîn de bi dehan pirtûkên jî serdema Sovyetê dubare heta carinan sêbare çap bûn. Her weşanxaneyê, bêyî ku li astê binihêre, bibêje ka li ser çî hatine nivîsîn, yan çî cure ne, weke birçiyên wêjeyê, ber bi van berhevan ve diçin. Her wiha çend lêkolîneran tezên masterê û beşên tezên doktorayê li ser wan nivîsîn di nava sê çar salên dawiyê de û di kovaran hejmarên taybet jî bo vê serdemê amade kirin. Kovara Nûbiharê û paşî jî ya Wêje û Rexneyê. Berî van jî kovara W çend hejmarên xwe li ser navên taybet ên vê serdemê amade kiribûn. Divê em berê xwe bidine sedemên vê yekê, belkî ya pêşîn, lêgerîna ronahî û humanîzma sekular a Kurdî ye. Wekî din, nişandana dewlemendîya wêjeya Kurdî û berdewamiya diroka wêjeyê ye. Her wiha berhevkirina çavkaniyên zimanê Kurdî û koleksiyonên wêjeya devkî çend mijarên din yê wê veçapkirinê ne. Her çiqasî, piştî lêkolînên salekê yê li ser vê rêûresma wêjeya Kurdî û pêşkêşkirina du gotaran, editoriya kovara Wêje û Rexne ku hejmara 9'an li ser vî nişîfî bû û gera min a bi qasî du hefteyan a li Rewanê, ne hedê min be jî di çarçoveya lêkolînê û gera xwe de, min xwest çend çavdêriyên xwe li vir parve bikim.



Dawid YEŞİLMEN



Mirovê Esed û Emerîkê Serdar

têyî de hêdî hêdî riya rast ditîne, em wan dibînin. Lê ev nihêrîneke pîr kêm e, heta radeyekê xelet e jî. Di berhemên wan de hertim nasnameya Êzîdîtiyê û bandora Ermenistanê yan jî Ermenîyan heye. Heger em xwendineke kûr li ser berhevan bikin, em ê bibînin ku welatê bav û kala, Kurdistan a Bakur, di pirriyê berhevan de birîn e jî wan re û bi nihêrîneke nostaljik lê dinihêrin. Ji ber ku jî Ermenistanê ne û heta jî destê dewletê hat piştgirî da wan û hurmetkar bû jî wan re. Gava tu wan jî Rewanê derxê, tu wê ruhê wan bikujî.

Ji xeynî vê xwendina nasnameyî, pirsgirêkeke lojîstîkî ya van lêkolînan jî heye. Bi taybetî jî bo lêkolînerên Bakurî wê dibêjin. Bila baş zanibin ku pirtûkên di destê wan de herî zêde jî sedî 20'ê yê wê dewrê ne. Bi taybetî hema bibêje yê rexneyî, lêkolînî yan zanistî yek jî di destê me de nîne. Gelek lêkolîn jî Rûsî an Ermenîkî hatine wergerandin lê haya me qet jî wan nîne.

Zimanên Ermenîkî û Rûsî dikarin pêwîst bin

Her wiha gelek nivîskarên wê dewrê xebatên xwe ye zanistî yan bi Ermenîkî yan jî bi Rûsî nivîsandine. Ji bo vê kêmasiyê, belkî gava yekem ku lêkolîneran ew be ku elfabeya Kirilî bê hînkirin. Ne karekî giran e. Du sê roj bes in. Di pey re jî gerîneke jî du sê hefteyan pêkhatî, hem li Rewanê hem jî li gundên Kurdan, wê alikariya fêmkirina wan berhevan bike. Heger lêkolîner li pey xebatên berfirehtir yê weke doktora yan hin bilindtir bin, bila salek yan du salên xwe jî hînkirina Ermenîkî yan Rûsî re texan bikin. Bêyî wan, xebatên ku bêne kirin, wê her tim xwedî pirsgirêka objektîvbûnê bin. Her wiha lêkolînerên ku tiştin li ser wêjeya Kurdî ya Rewanê nivîsîbin, her tim dane dût sinifandina Tosînê Reşîd û kirine sê dewr. Pênc dewr jî dibin, şeş jî. Weke Emerîkê Serdar dibêje, du dewr jî dibin. Ji çapkirina Rya Teze heya parçebûna Sovyetê, an jî çapkirina Şemsê heya roja me jî her dibine dewr. Ne hêsani ye ku mirov bi awayekî zelal wêjeyê di navbera dewran de bisînifîne. Hem jî ber bandora metnan hem jî ji ber berdewamiya nivîsandina di navbera wan dewran de sinifandin ne rêbazêke pêşniyazkirî ye. A muhim ew e ku li gorî dem, cî û metnan nexşeyêke zelal ya wê serdemê derxwe holê. Ji ber ku behsa derdora 800 berhemî û zêdetirî 100 nivîskarî tê kirin ku iro arşîvên wan û ew bi xwe jî berbelavî dinyayê bûne.

Belavbûn û dizîna arşîvan weke pirsgirêk

Pirsgirêkeke din a lojîstîkî jî weke min li jor behsa wê kir, berbelavbûna nivîskarên û arşîvan ya li seranserê dinyayê ye. Ji ber vê yekê, hatina Rewanê jî pirsgirêka bi giştî çareser nake bi ya min. Helbet jî bo xebatên biyografîk malbatên ku behsa nivîskarên jî malbata wan derketî bikin, wê hebin, lê mixabin carinan agahiyên wan jî bibirandinên jiyana ro-

jane nabihûrin. Her wiha gazînen berbelavbûna berhevan jî wê pirsgirêkeke din be. Malbat carinan gazîna dizîna yan jî windakirina berhemên di arşîva xwe de dikin. Divê em zanibin ku li ser rûyê erdê arşîveke dewlemend, parastî û katalogkirî ya Kurdan nîne. Bi taybetî piştî hilweşîna Sovyetê, arşîvên Kurdan yê Sovyetê belav bûn. Em van agahiyên jî şunwarên wê rêûresmê her dibihîzin. Bêqîmetbûna pirtûkan, dizîna wan yan jî frotina arşîvan her pirsgirêkên sereke ne. Lê her wiha pirsgirêkeke din jî dezgeheke Kurdan ku van arşîv û pirtûkxaneyan li hev bicivîne, biparêze û jî lêkolîneran re veke jî nîne. Weke minak, ev du sal in li pey şoparnameya Rya Teze me ku hejmarên wê tevan bibînin, lê hîna negihîştîme wê armanca xwe. Ji ber ku nehatiye parastin.

Her wiha em nizanin bê gelo dewletê ev arşîv parastine yan na. Ez heta niha li ti lêkolînerî rast nehatime ku li arşîvên dewleta Ermenistanê geriyabe. Her çiqasî min xwest xwe biceribînim jî mixabin bi ser neketim. Ji ber van çend pirsgirêkên li jêr, lêgerîna min kêm ma û min jî bo demekê da sekinandin. Yek jî sedeman, burokrasiya giran ya dewletê bû. Di dawîya hefteyê de, di rojên pîroz û cejnan de û di betlaneyên havîn û zivistanê de dibistan, zaningeh, pirtûkxane û arşîv tev girtî ne. Jixwe xebatkar bi Kurdî nizanin. Pîr kêm bi Îngilîzî dizanin. Ermenîkî û Rûsî zimanên axaftinê ne. Her wiha ji ber rewşa xirab a aborî û meaşî kêm, dibê ku xebatkar bi kêfxweşî bi te re elaqeder nebin. Her wiha ez gihîştîme wê hîzrê ku jî karê xwe angore naveroka arşîvan jî baş ne agahdar in. Peydekirina wergêrêkî wê karê lêkolîneran hêsantir bike. Peydekirina wergêrêkî jî bo Îngilîzî an Tirkî jî ya yekî Kurdî hêsantir e.

Heger tu hinekî bi Îngilîzî bizanibe an wergêrêk bi te re hebe, di dawîya hefteyan de dikarî li bazara II Meydana Komarê, jî pirtûkfiroşan pîrsa pirtûkên Kurdî bikî. Heger di destê wan de hebin, zêrê zer e jixwe. Heger nebin jî wê soza ku hefteyêke din binin, bidine te. Pirriyê wan peyde nakin. Lê kî dizane, belkî kêm be jî peyde bikin. Her berhemek wê kevîrekî deyne ser diwarê lêkolînê di vî warî de.

Li jêr çend xebatên ku jî aliyê nivîskarên Kurd yê Rewanê ve hatine amade kirin ku rasterast dengê wan digihîninê xwendevanan, wê jî bo destpêkê rê li ber lêkolîneran vekin:

- Boyik, Eskerê. Çanda Kurdên Sovyetê, Deng, 2012, Stenbol.
- Boyik, Eskerê. Bi Kurtayî Diroka Êzîdîyên Ermenistanê, J&J, 2017, Amed.
- Eşo, Wezirê. Pirtûkên Kurdî, Ararat News/Med Diplomatic Publishing, 2016, Bruksel.
- Yüksel, Metin. Kurdoloji û Malbata Celîlan, Avesta, 2014, Stenbol.
- Xelilî, Têmurê. Antolojiya 35 Helbestvan û Nivîskarên Kurd ên Sovyeta Berê, Na, 2014, İzmir.
- Serdar, Emerîkê. Mikurî, Lis, 2018, Amed.

Folklorîzekirina civaka Êzîdî Bakursentrîzm

Ji lêkolînê ku heya niha hatine kirin, kêmasiya pêşîn ku ez dibînim, jî hêla wêjeyê ve, em vê rêûresmê gelekî sivik û zelal dibînin ku herkes divê heman tiştî jê fêm bike. Lê rastî ne wiha ye. Ji hêla nasnameya civakî ve xwedî gelek hêlên cihê ne. Ji Kurdên Bakur. Qutbûneke nêzî sedsalî li rexekî, dive em jî bir nekin ku jî xeynî Erebe Şemo û yek du kesên din, jî nişîfî pêşîn bigirin heta yê dawiyê, di nav şewra Eza-dayetiye de û di bin banê rejîma Sovyetê de li Ermenistanê mezin bûne! Heta nişîfî pêşî li sêwixaneyan mezinbûne ku ev yek wan yekcar jî civak û kevneşopiyên Kurdî dût di xê. Her çiqasî em Êzîdîyan weke Kurd dihesibînin û civaka ku Kurdiya herî dewlemend û zelal jî bi kar tîne dihesibînin jî, di rastîya xwe de em tenê vê civakê folklorîze dikin. Ne tenê folklorîzekirin, lê her wiha nihêrîneke bakur-navendî jî di hişmendîya xwe de ava dikin. Dan û standînen civaka Kurdên Misilman û Êzîdî, hin jî di çarçoveyêke rasteqîn de pêk nehatine ku em berhemên wan jî xweş fêm bikin. Em şewra hikûmeta Sovyetê jî, tenê jî ser çepgirîya Tirkî re dixwînin. Ji ber ku jî yek du wergerên xirab yê jî Tirkî pê ve li ser vê îdeolojiyê tiştê di Kurdî de nîne. Her wiha em Ermenîyan jî bibirîna bav û kalên xwe dizanin. Lê ew zanîna me bi giştî li ser wê yekê ye bê çawa hatine qetilkirin. Lê weke dewlet, em Ermenistanê nas nakin. Her wiha, dive baş bê zanin ku di nava Sovyetistanê de, welatê ku piştgirîya zimanê Kurdî kirî, tenê Ermenistan bû. Dezgeh, dibistan, rojname û hwd hemû li Rewanê bûn. Kurd di nav sîstema wê dewletê de bûn û di bin bandora hişmendîya wan de karê xwe dimeşandin. Bandora dewletê û neteweperwerîya Ermenîyan li ser Kurdan dibû. Ji ber vê yekê xebateke bêyî xwendineke diroka Ermenistanê wê her kêm bimîne.


Tu wê ruhê wan bikujî

Gava em berhemên wan dixwînin, em wan hertim weke Kurd ku rejimê îdeolojiya sosyalîzmê li ser wan ferz kiriyê, dibînin. Yan jî em dixwîzin wan wisa bibînin. Weke nihêrîneke diakronîk, wan weke nişîfêkî li ser riya xelet ku di salên hef-



‘Helbest

giriye min e’



► Ez nikarim xwe qure bikim û rabim bibêjim, wele ez filan felsefê, hestê yan jî filan tiştê didim xwendevanên xwe. Lê ez dizanim, ez ji dil dinivîsim.

Fatma Savci gava behsa helbesta modern a Kurmancî dibe, nexasim ji di nava helbestvanên jin de navê wê di nav şairên şareza de tê hildan. Fatma Savci ya ku bi Gulên Qasid, Xewnên Zivîn, Dotmara Lal helbestên xwe qevd qevd anin ber destê xwîner, timî tahma êşekê di helbestên xwe de digêrin. Xwe ji kiteke xurici jî nahêle. Behsa navan dike, keliyê jî jiyana xwe dike, biranînekekê dibêje. Lê herî zêde êşbêjiyê dike. Helbestên wê bi dizî li dora me digerin, bi xafilî di nav xekekê de me asê dihêlin.

Me jê pîrsa jiyana, huner û helbestvaniya wê kir û wê ji li me vegehand.

Tu helbesta xwe dispêrî ku serpêhatiyên te çiqas reng daye helbesta te?

Di nava keftûlefa jiyane de tûrikek heye bi milê me ve û em vî tûriki bi tecrûbeyên xwe dadigirin. Ez bawer dikim, hemû nivîskar ji jiyana xwe didin rê. Ji bîr û baweriyana. Helbest çavkaniya helbestên min jiyana, dîtina û biranîna min in. Lewre ez ji jî vî tûriki dixwim. Ez behsa xwezayê dikim, bi taybet a Kurdistanê. Bêrîkirina, evînenê nivçê vedibêjim. Xeyal, xewnên şin in, zadê aşê min. Ev hemû bi tîsta min jiyayî re têkildar in. Heger ez ne jine Kurd û yekê di nav tîkoşinê de bi ciwanî cihgirtî bûma, belkî ji ez ê nebûma. Hebûma ji bi rengêkî din minê terh bida.

Ya rastî, ev karê rexnegirana. Belkî ew rabin bibêjin ka helbesta vê çima wilo ye. Lewma naverok û çawaniya helbestên min malzemaya rexnegirana. Lê ez bi wê yekê re me ku helbesta min hilberîneke kolektîf e. Ne tenê helbesta min, lê çirok û biranîna min jî kolektîfînekê dihewînin. Tiştên hatî serê

me ne. Pîraniya jiyana min di nav yekê kolektîf de bihurî.

Kolektîfîbûneke çawa?

Ez minak bidim. Wexta ez li çiyê, di nav refên tîkoşeran de bûm, ferdîyetî kêm bû. Em bi hev re bûn. Weke kesekî diyarîbûneke taybet tine bû. Bêhtirî xwe, em grûp bûn. Mangayek bi hev re em radibûn û rûdiniştin. Êrişên dijmin li ser me tevan bûn. Li nav berfê meş parek bû ji me hemûyan re. Di zindanê de hakeza, carinan em 60 jin di qawîşekê de diman. Jinek bi kabûsekê şiyar bibûya, em hemû pê re şiyar dibûn. Me dizanî ew jin çima hilçiniyaye, di xewna xwe de tirsîyaye û rabûye. Me texmîn dikir, ew çî kabûs e ji ber ku ew kabûs a her 60 jinan bû. Bi êşa hevalake xwe, me giştan ta digirt. Nûçeyek dihat carinan, xerab, em gişt xemgîn dibûn. Bîrçîbûn bûya, em hemû bi grev bûn. Jiyanekê kolektîf bû ya me, ne weke gelek kesan jiyaneke takekesî.

Helbesta te van diteyîshe?

Ez dixwazim bibêjim, helbesta min ne tenê li ser bîra min şin dibe. Carekê, di televîzyonekê de pêşkêşvanekî ji min pirsî, ‘Çima tu di helbestên xwe de nabêjî ez lê em tercîh dikî’ Piştî wê keliyê hin fikar li min peyde bûn. Min jî ji xwe pirsî êdî çimaniya wê.

Ma te hay ji vê ango ‘Me’yê ne bû?

Na. Ez, haya min jê nebû ku ‘em, me’ bi kar tînim. Piştî wê îcar min hinekî hewla guherandina wê da. Ji ber ku ez lê fikîrîm û min ji xwe re got, belkî ez neheqiyê dikim. Kesên ku min bi wan re kolektîfîbûnekê bihurand, belkî weke min ne bedbin in. Lewma ez neheq im bi bedbîniya xwe bibêjim

‘em’. Axirî, mabesta min nişandayîna bireweriya kolektîf e. Ez dizanim helbestvanê cihanê yan jî yên Kurd ku ji çandeke kolektîf tahm kirine, belkî cihê bin jî fikra min. Û ti gotineke min a başî yan xerabiyê li ser vî tene. Ev encamake jiyana min a ferdî ye.

Helbestên te tîra xwe melankonîk in. Melankoltizm û hez a ji jiyane çawa hev dihewînin?

Ji bo min helbest cihana min a hundurîn e. Gelek kesên ku min nas nakin, gava li rastî min tîna, dibêjin, ma tu dikenî, jî hinekan hez dikî? Lê kesên ku min nas dikin, pê dizanin, bê ez çiqas qedr didim jiyane û kenî. Ev mayîna min a li dinê ye. Lewre, ez her hewl didim ku fêrî tiştêkî nû bibim. Berxwedana min a jiyane her li ba ye. Lê helbesta min, axirî ew dinyaya min a hundurîn e ku ez didim der. Ev rastiya wê ye. Ev rengîni ye bi ya min. Ma dibe, insan tişteke tenê be. Na insan ne tenê rengê e jî.

Helbest amûreke bo min ku ez dilê xwe pê dihedînim. Hin kes digirînin mesela bi heman xwestekê. Lê ez zû bi zû nagirîm.

Çima tu nagirî?

Ez fêr bûme. Ez xwe radigirîm ku negirîm, da lawaz nexuyim. Hin jî têsîra van tiştan li ser min giran e. Lê gava ez helbestê dinivîsim, çiqas aciz bim jî dilê min rihet dibe. Weke xweşiya piştî girî ku gelek xwe dispêrinê.

Ne ji bo kesan jî dinivîsim. Yanî ti armanca min tine, ka ez ê çî, çawa bidim xwîner. Gava ez dinivîsim dilê min rihet dibe. Ez û helbest, hezkirina min e ew. Heta jê hez nekim jî qîma min pê naye û dilê min rehet nabe. →

Bi risteke te, ez ê ji te bipirsim ji xewnên me re hîn çend demsal hene, çend mirinên din em ê rakevin?

Hest li ser rastiya jiyane ava dibin. Qedera me tûj û dijwar e. Em ji diroka xwe dizanin. Kêlî bi kêlî em dimirin, nexweşî diqewimin li welatê me. Rewşa bajar û gundên me li meydanê ye. Em kesan winda dikin, yên me ji wan herî zêde hez kirî. Şûna me jî êdî xera dikin, ji gundan bihurîn dora goristanên me jî anin. Ev têsîreke giran li ser rûhiyeta mirov dike. Ez ne keseke bêhêvî me. Xwedan hêvî me ku em ê bi awayekî ji windabûnê bifilitin û hebûna xwe nemir bikin. Dizanim ne hêsan e. Ev mirina li dora me digere, wê biçîke.

Xwendevanên te çawa qedrê te digirin? Tu çi didî xwendevanên xwe?

Ya rastî, gava ez dinivîsim bêhtir bi xwe û birinên xwe re mijûl im. Helbet gava ez van gotinan dibihîzim, pîrr kêfxweş dibim. Mesela carekê min bihîst, hin ciwanan carekê li cafeyeke li Mêrdînê weke navê gelek kesan navê min jî li ser darekê nivîsibûn. Da ku nişan bidin, em qedrê didin we.

Rojekê ez li vir, li Ewropayê pîrr êşiyam û min berê xwe da Stenbolê, xwe li kitêbxaneyekê girt. Ez gelekî êşiyabûm. Tenêbûn, dûrbûna ji her tiştî, nûçeyên bi şewat gişî, tevde dabû ser min. Axir ez li wir, li rastî du ciwanan hatim, min jî ji xwe re li kitêban dinîhêrî. Ji xwediyê pirtûkxaneyê re got, ma vêga ev ne Fatma ye. Hatibû da ji hevala xwe re pirtûka min bikire. Min li wir ew hezkirin baş his kir. Çiqas kêfa min hat.

Lê ez bi vê yekê jî dizanim ku hejmara xwendevanên Kurmancî mixabin hindik e. Pirtûka min a herî zêde tê xwendin bi hezar nûskeyî keys li çapê aniye. Mixabin, em dizanin ku xwedîderketina li edebiyata Kurdî lawaz e. Helbet tiştên baş ên dibin û heyî, ez tine nahesibînim. Lê rewş xeter e. Ev rastî, kêfxweşiya li jorî min qala wê kirî nîçe di-

Kêliya gardiyan deriyê qawîşa me vekir, da ez pê re herim, piştî xatirjhevxwestinê hevalekê bang kir got, Savci ma ne hîn civata me mabû. Bi fikire 7 sal. Lê hîn civata me mabû.

hêle. Yanî em dişibin cemaatekê. Diyardeyê tine ku bi awayekî şênber nişanî me bide, ka Kurdî çi qasî li rastî elaqeyê tê. Heyf e, em hîn ne xwediyê wan sazîyan in ku bi vî karî radibin.

Li aliyê din, ya rastî, ez nizanim çi didim xwendevanên xwe. Ez nikarim xwe qure bikim û rabim bibêjim, wele ez filan felsefê, hestê yan jî filan tiştê didim xwendevanên xwe. Lê ez dizanim, ez jî dil dinivîsim. Belkî pişka vê yekê di nav têsîra li wan dibe de, heye. Ti kula min tine, ez hîn hevkên bi xeml binivîsim.

Mirov pêrgî 'bir'ê tê di helbestên te de. Bi awayekî ji awayan hewleke te heye, tu berê mirovî bîdî rabihuriyê?

Belkî mesele ez bim. Ez bi xwe diçime rabihuriyê jî ber ku pêdiviya min pê heye ku ez biçime bîra xwe. Lê ez ne bi wê qenaetê re me, hinekan bibim rabihuriyê. Yanî ti niyeta min tine ku ez dersekê bidim hinan, berê wan bidim derêkê, fikrekê û hwd. Tiştê ez bi serê min de tê, bir, xewn, xeyal û xwezîyên xwe tenê parve dikim. Lê belê heke ji destê min bihata, min tenê dixwest hêviyê bidim xwendevanan. Minê ti carî dewsek jî xemê li ti çinekî nehişt. Min ê ti carî bi xemgîniya xwe ti kesek bedbin nekira. Heke min bikariya, ez ê bextewar jî bibûma. Lê di wê kêliyê de ku ez bextewar im, ez helbestan nanivîsim. Helbest giriyê min e. Ez jî bo bextewariyê nagirîm.

Tu gerfîlta 16 saliya xwe, 12 sal hepsî, niha jî li xerfîbiyê yî. Dilê te bi kîjan çaxî xweş e?

Tevî ku ez behsa xeman, êşan, mirinan, çûyinan dikim jî ez jî her wexta jiyana xwe hez dikim. Ez ne poşman im jî yek wexta xwe. Lê bila xelet neyê fêhmîkirin. Ne ku ez jî qedera Kurdbûnê yan jî ya Kurdan razî me ku jin, xort û mêrên Kurd mecbûr in, rabin berxwedanê. Na. Ez dizanim ev rastîyek e. Lê di nav vê rastîyê de heger heps be, heger penaberî be jî wexta mirov kir, bi dilê xwe kir, ez pê tenê serbilind im. Lê ez bi wê yekê re me jî ku çi dibe bila bibe, divê mirov afirîner be. Gava ez li zindanê bûm, hewla min hebû ku ji hevalên xwe fêrî tiştêkî bibim. Hevalên gihayî, ji zaningehan hebûn. Li ser sosyolojiyê li ser gramatika zimên min jî wan alîkarî dixwest. Bi min re gelekî betilîn. Ji ber ku min tenê 5 sal djibistan xwendibû. Civata me bêdawî bû.

Ez ê jî te re bibîranînekê bibêjim. Li girtîgeha li Stenbolê, Sağmaçlar, 7 salan ez fagirtî mam. Carinan greva birçîbûnê çêdibû. Ji ber ku ez lawaz bûm, zû nexweş diketim. Carinan serûm li herdu destên min didan. Lê hevalan bi çengê min

digirt, diketin milê min û digotin; rabe em voltayekê biavêjin. Ka were Savci em çirokan jî hev re bibêjin. Piştî mayîna li wir bi heft salan, operasyonêk çêbû, sewqa min derket da ku ez herim girtîgeha li Mêrdînê. Kêliya gardiyan deriyê qawîşa me vekir, da ez pê re herim, piştî xatirjhevxwestinê hevalekê bang kir got, Savci ma ne hîn civata me mabû. Bi fikire 7 sal. Lê hîn civata me mabû. Ev yek jî bo min bextewariyê pîrr mezin û bi qedr e. Ev yek paşê jî min re bû bangeke jiyani.

Hakeza li gerfîla. Ti rêyeke din jî me re tine bû. Çûyîna min a nav gerfîla jî min re tekane rêya xelasbûnê bû, ez vê ne weke sloganekê dibêjim, yan ez ê bimirama yan jî ez ê biçûma. Di 16 saliya xwe de, bi zanin û bi birewerî jiyana ku ez mecbûr bûm bidim ber xwe, min qebûl nekir û berê xwe da çiyayan.

Niha li Ewropayê jî ez fêrî gelek tiştên din dibim. Ez tedi-gihim ka ev welat çawa bi zanistê radibin. Rêbaza hevqebûlîkirinê, toleransê ez dibinim li vir. Ev jî ji bo min xweş in.

Tercîha awayê nivîsandina te ya helbestan ne sabt e, sedemeke taybet heye gelo?

Carinan, heştin hene ku ez nikarim di nava teknîkekê de bifetîsinim. Lewre mirov dikare vê yekê weke peşxana helbestî bi nav bike. Lê dijê min ne bi wê yekê re ye ku ez hin sinorên teknîkî jî xwe re ava bikim. Ji berdêla di nav golekê de ez soba bikim, hez dikim li nav okyanûsekê de bim.

Baş e îcar tu hez dikî kê bixwîm?

Ez hewl didim, hemû berhemên ku bi Kurmancî derdik-evin bixwînim. Helbet yên ji Bakur bêhtir dikarim bi dest bixim. Lê yên ji Başûr û Rojava jî ez bi qasî ku bi dest dixim, dişopînim û dixwînim.

Niha tu çi dikî?

Berê di radyoya Swêd de min raport çêdikirin. Lê ez ma-mostetiya zimanê Kurdî dikim. Û ev 7 sal in zarokan fêrî Kurdî dikim. Ji wan re behsa çand, huner û diroka Kurdan dikim. Helbet jî wan jî fêrî tiştan dibim.

Helbestên min ên min neweşandî, vêga bûne tibabek. Lê dilê min niha ne pê re ye ez wan weke dosyayekê biweşînim. Lê béguman, gava bi dilê min kamil hatin, ez ê wan biweşînim.

Lê projeyê min a din heye. Ez çûbûm nav gelê Samere. Ew xelkê li Swêdê dijî ku welatê wan weke yê me Kurdan bûye çar parçe. Ew jî belav bûne, pîrraniya wan li Norwêc, Swêd, Finlandiya û Rûsyayê dijîn. Wexta min dest bi vê projeyê kir, di kitêbêke wan de li ser rûpelekî nivîsîne, "Ma hûn dizanin ku welatê Kurdan jî weke yê me Sameran bûye çar parçe. Zimanê wan qedexe bûye." Îcar ez bi pey wan ketim û dixwazim weke pirtûkê vê xebatê biweşînim.



Dikitêbeke Sameran de li ser rûpelekî nivîsîne, "Ma hûn dizanin ku welatê Kurdan jî weke yê me Sameran bûye çar parçe. Zimanê wan qedexe bûye." Îcar ez bi pey wan ketim û dixwazim weke pirtûkê vê xebatê biweşînim.

John Keats

ê navê xwe li avê nivîsî *

KEWA BERBANGÊ



Kawa NEMIR

Keats di nameyekê de ji birayê xwe yê ezîz, George re gotina xwe ya dîrokî jî nivîsî: *“Ez pê bawer im ez ê piştî mirina xwe tevî helbestkarên Îngilîz bibim.”*



Helbestkarê Îngilîz ê navdar ê yek ji girîngtirîn pêşengên serdema helbesta romantîk a Îngilîzî yê ku helbesteke firawan û rewbanbêjyeye mişt bi hêmayên çihana Yewnanî di temenê xwe yê kin hilda.

Keats sala 1795'an li Edmontona nêzîkî kevnebarê û paytexta Îngilîstanê, li Londonê ji dayik bû. Di sala 1804'an de, bavê wî û piştî bavê bi demeke kin ji dêya wî mir, jê û pê ve li gel xwişk û birayên xwe kete binê baskên yekî dilhişk. Vi kesî paşê destê xwişka wî ya ku li ber dilê Keats ezîz bû ji destê Keats kir. Tevî vê yekê, Keats perwerdeyîyê baş girt. Hê di heyna xwendekariya xwe de dastana *Aeneid* a Vergilius wergerandê Îngilîzî, hê ji wê hingê ve nîşan da ku wê bide dî kelepura mezin, ku para Chaucer, Sidney, Shakespeare, Alexander Pope û John Milton tê de pîr û gelek e. Sala 1810'an, wî li ba cerahekî di dermangehekê de dest bi staca xwe ya bijîşkiyê kir, di 1816'an de ji dev ji karê xwe yê di nexweşxaneyê bi navê *Guy's Hospital* de berda da ku yekcar xwe bide xwendinê û nivîsîna helbestan. Leigh Hunt, ê ku berhemine wî yê pêşîn çap kirin, bi wî re bû alîkar. Di Adara 1817'an de, diwana wî ya pêşîn a bi navê *Poems* (Helbestekan) hate belavkirin, lê weşanan wê hingê, nemaze *Blackwood*, êrişeke dijwar birine ser Keats, wekî qaşogiravî zimanê Keats zêde zêde bi xeml û xêz û bilindgo ye. Keats ji van êrişan eşiya, lê neda paş û pêş, di nameyekê de ji birayê xwe yê ezîz, George re gotina xwe ya dîrokî jî nivîsî: *“Ez pê bawer im ez ê piştî mirina xwe tevî helbestkarên Îngilîz bibim.”*

Dema ku helbesta wî ya dirêj, *Endymion* hate weşandin, kovarên bi navê *Blackwood* û *The Quarterly Review* li wî hatin xezebê. Pê re jî, destê wî du birayên wî qetiya; George xwe girê da, koçî Emerikayê kir, di meha Berfanbarê de jî, Tom mir. Paşê Keats *la belle dame sans merci* ya xwe ya navdar, jina bi navê Fanny Brawne nas kir û heta mirina xwe bi hesteke têkelê xweşî û janê ji wê hez kir. Ev evin ji yek ji wan evînên navdar e di dîroka Wejeya Çihanê de.

Îro ro, civata helbesta gerdûnî pak pê dizane ku Keats ne bi tenê bi risteyên dawî ên helbesta xwe ya bi navê *Ode On A Grecian Urn* (Xezel Li Ser Guldankeke Grekan) ve ku dibêje,

*“Bedewî rastî ye, rastî bedewî ye,” – tev ev e her kat
Tu li dinyayê bizanî, hemû tiştê divê bizanî jê û pê de.”*

her wiha bi gelek helbestên xwe yê dirêj û kin ve navê xwe li bircên helbestkariya çihanê kolaye.

Keats di 23'yê Reşemeya 1821'ê de li Îtalyayê, li Romayê ji ber jana zirav, hê 26 salî, jiyana xwe ji dest da û termê wî li wir hate veşartin. Ciyê ew lê mirî îro *Mûzexaneya Keats-Shelley* e, ku dûrebîniya helbestkarekî gewre rast derket, Keats piştî mirina xwe bi demekê bi rastî ji tevî kelepura xwe ya mezin, tevî helbestkarên Îngilîzî û çihanê bû.

Li dû wesyeta wî, li ser kêlikê gorra wî wiha hate nivîsîn: **Here lies One Whose Name was writ in Water** (Li vir veşartî ye Yekî Ku Navê Wî li Avê Hate Nivîsîn)

* Nişe: Ji bo ku zanyariya der barê arşîva xebatên min ên wergerê de li vir tomar bibe, ji 1995'an heta niha min 120 helbestên John Keats ji Îngilîzî wergerandine Kurdiya Kurmancî û ev hê jî wekî pirtûk nehatine weşandin. (K. N.)

Sone
Bo Homeros

Ji xwe re sekinîme mitîmat û bê hay ji Felekê,
Salixên te û yê Cycladean dibihîzim hûr hûr,
Wek kesekî ku rûnê li peravê û, te di, bikişîne keserekê
Ku biçê dîtina mircana delfînan a li binê deryayên kûr.
Wisa ye, tu nebîna bûyî; – lê paşê xêlî hate vedêrandin,
Jove perdeya Biheştê rakir ku tu bijiyî, bikî starê,
Û bi destê Neptune bo te reşmaleke kefikî hate afirandin,
Pan jî kir ku kewara wî ya daristanê bo te stranan bistrê;
Erê, erê, şewq û şemalê girîyê ser peravên tariyê,
Û kendalên kûr xûzî ser mîrgên xam bûne ji xwe re,
Şev nivê şevê, beyaniyek peyda bûye, dibişkive li wê,
Bîniyeyê sê carî xurtir heye bi nebînatîya baz re;
Te bîniyeyê wisa hebû, weku wextekê hatibû serê
Dianê, Keybanûya Rûzemin, Biheştê li jorê, Dojeha li jêrê.

1818

Bo Hêviyê

Gava ku ez li ber bixêriya xwe ya dilguyêş rûnêmin ji xwe re,
 Û hizrên nexweş min dorpêç bikin tevî xelexa xeman;
 Gava ku çu xewnên şêrîn li hev neyên
 û neçin di ber 'xeyal'a min re,
 Û xozana hişkebeyar a jinê venede çu gul û sosinan:
 Hoy Hêviya delal, xweşbêhna esmanî li ser min biwerîne,
 Û per û baskên xwe yên zîvîn li ser serê min bijenîne.

Çi gava ku ez sergerdan bim, danê êvarê,
 Li warê ku çiqên gumreh ber pertewa geş a heyvê digirin,
 Heke Bêzariya ciyê kovanê ponjanê min bitirsîne,
 wan bike averê,
 Û rû tirş bike da ku berederî bike Şadiya şêrîn,
 Tu raçavan bike tevî tîrêjên heyvê di nava sîwana peldar re,
 Û dîr bigire wê Bêzariya dilkevir a ku mereqdar e.

Eger bê û Dilşikestin, ew maka Bêhêvîtiyê,
 Bo keça xwe bê xîretê ku desteser bike dilê min ê terkexem;
 Gava ku, wek ewrekî, ew hilde çap bike hewayê,
 Li kar be ku daberize neçira xwe ya şeyda bê rehme:
 Hoy Hêviya delal, sûret î geş, tu bide ser piştê wê,
 Û wê bitirsîne çawa ku beyanî ditirsîne şevê!

Çi gava ku feleka wan ên li ber dilê min delal
 Çirvanokeke diltezin bibêje dilê min ê qutiya tirsan,
 Ax Hêviya rû û dil geş, tu şên bike xeyala min a bêhal;
 Şêrîntirîn xemrevîniyên xwe bo gavêkê
 bi deynî bide min, hema wisan:
 Nûr-nedera xwe ya ji Şems zeyînî li dora min biwerîne,
 Û per û baskên xwe yên zîvîn li ser serê min bijenîne!

Eger bê û heza bedbext agirê kulê berde dilê min,
 Çi ji bav û kalên xedar be, çî ji bedewa dilkevir a revê;
 Ax ez nebêjim, ev kar lap pûç e, nehêlî ev yek bê dilê min,
 Heke tevî axinkêşana min şîrê bidêrine hewayê nivê şevê!
 Hoy Hêviya delal, xweşbêhna esmanî li ser min biwerîne,
 Û per û baskên xwe yên zîvîn li ser serê min bijenîne!

Bi maweya rêzeqewamên dirêj ên salên ku lev bibin gelwaz,
 Nehêle, ez nebinim ku rûmeta welatê me bişikê:
 Ax, bihêle bibinim ku xaka me biparêze gijanê xwe yê baz,
 Şanaziya xwe, azadiya xwe; ne ku azadiya li ber şikê.
 Ji awirên xwe yên geş rewşena derasayî biwerîne –
 Bila per û baskên te bibin sêla esmanî li ser serê min e!

Ez nebinim weseyeta gewre ya niştimanperweran,
 Azadiya gewre! ku çendî gewre ye
 tevî cil û bergên bê xeml û xêzî.
 Serweriya çepel a qesr û diwanekê ew kiriyê dêran,
 Stûyê xwe xwar kiriyê, lê ye ruhê jê bikîşe bi xîzêzî:
 Lê ez bibinim ku tu ji jorê de serejêr bîdî per û baskan,
 Ên ku bi şemala zîvîn tîji dikin her heft perên esmanan!

Û bi şikûdariya bi çik û çirûşk, çawa ku stêrkek
 Hildide zêravî dike lûtkeya geş a ewrekî tarî;
 Ji dîr ve diteyisîne rûyê niv xêlî kirî yê esmanê tek:
 Wisa, ku barana hizrên tarî li gijanê min ê bendewar barî,
 Hoy Hêviya delal, hukmê xwe yê pîroz li dora min biwerîne,
 Per û baskên xwe yên zîvîn li ser serê min bijenîne.

Rêşeme, 1815**Li Ser Navdariyê**

Navdarî, şibhetê Keçêke serhişk, dê hê ji naz û tûzan bike
 Li wan ên ku pîrr bi tepeserî stûxwar, xwe xweş bikin bi wê,
 Lê tu were, ew xwe radestî Kurikekî qeşmerî dera hanê dike,

Û dibe şêrî û şeydaya dilekî aza ji xof û sawê;
 Navdarî Romanîyek e, ew ê neaxêve li gel wan
 Ên ku hin nebûne bê ka çawa bêyî wê bibin xweşal;
 Yara derewîn e, kesî devê xwe bi kurtepişt nekirî
 guhê wê çu caran,
 Ya ku dibêje qey xelqê devbelaş xeybê wê dike her hal;
 Romanîyê xwerû ye ew, ku ji piştê Nilus ketiye,
 Dişa Potipharê dilreşî çavnebar e;
 Lo Dengbêjê sewdaser! ew erzîşkên e, rûmeta
 wê bike kûtê sê ye;
 Lo Hunermendê bi derdê dil ketî! tu dîn î, ev ne ti kar e!
 Ji wê re baştirîn serçemandina xwe bike û bibêje, bi xatirê te,
 Wê hingê, heke ew ji wê yekê hez bike,
 ew ê bi xwe bide pay te.

II**"Agir û av, gur û ml li ba hev nabin." – Gotina pêşiyên.**

Mirovê ku nikare bi xwînsarî berê xwe bide
 Rojên xwe yên nemîn, îcar çawa ji dibe dilalav,
 Ew ê ku hemû pelên kitêba jiyana xwe tev dide,
 Û dereve dike navê xwe yê zerif ê ciwanîya çûyî av û av;
 Tu dibêji qey divê gul xwe bike talan û tajan,
 Yan ji şîlora gihîştî biniçîne kulîlka xwe ya mijê girtî ser,
 Weku Naiadek, mina periyêke şelûfê e nestrî,
 Divê şikefta xwe ya pak şêlî bike bi diltengîya jehr,
 Lê gul pelan digire bi saya serê kelem û strî,
 Da ku ba wê ramûsîn û xwedî bibin
 mêşhingivên berhemdar,
 Û şîlora gihîştî dîsa ji dikeve dilqê xwe yê rengzerî,
 Ku deryaçeya asûde ji gera belorî hebe,
 Nexwe mirovê ku ji bo rûmetê li çîhanê tînazker be
 Bo çî rizgariya xwe bilewitne ji bo
 şaşbaweriyêke hov û dijwar?

Sone

Axl çendî ez hez dikim wekî êvara havîneke xweş,
 Çaxa ku dadirijîne rojavayê zêrîn şîpên ronahiyê yên boş,
 Û li ser piştê bayên xerbi yên tîngîr vedihîsin xamox
 Ewrên zîvîn, bi dîr – zehf bi dîr bivekim keş bi keş
 Ji hemû sayîşan, û bi xweşiyê şa û hênik be dilê min,
 Aza bim ji xemên tewş; da ku lê bigirim bi kêfa dil,
 Bibinim çolwarekî bêhnxweş,
 bedewiya Siruştê kirî berg û cil,
 A li wir dikeve ber bayê kêf û zewqê gijanê min.
 Li wir kela dil li min radibe li ber kelama niştimanperwer,
 Diponijim li ser feleka Milton – li ser darbesta Sydney –
 Ta ku dilqên wan ên awirbaz berceste dibin li hişê min:
 Dibe ku ji li ser baskê Helbestê ne, li bala ne bi fir û ger,
 Gelek caran dibarînin hêsireke çêjmey,
 Gava ku kovaneke xweşawaz dibe niştî li çavê min.

Sone**Bo Banûyên Ku Ez Tac Wergirtî Dîtîm**

Ka li vî Serzemînê bê ser û bin çî heye, ka,
 Ku ciwantir be ji Zerzengeke ji dara defneyê?
 Dibe K' Xermaneyêke l' dora Hoyvê – şadiyek ji şadiyê
 Ya ku bi bazineyî tî ji sê cotên şêrîn ên Lêvên şa;
 Dibe K' ji hûn ê hildin bibêjin, bişkivîna xunavî, ew ha,
 Ya Gulên beyaniyê – pêlikên ku bi tewrê nazikiyê
 Weriyayî ber sîngê Halcyona li ser Deryayê –
 Lê ev Berawird bi kîrî pînc qurîşan ji nayên ha –
 Nexwe gelo çu tîşteki hinde bedew nîne di çîhanê de?
 Firmêskên zîvî yên Nîsanê? – Nûciwanîya Gulanê?
 Yan ji Xîzêrana ku henaseya jiyandê didê minminikan?
 Na – çu yek ji van neşê piştê ya min a guzîde
 Bîne Erdê – hêştê ew ê her û her deynê
 Rêzgirîna Berz bide çavên we yên xunkarên xunkaran.

Sone**Bo Fannyê**

Bextê xwe xera meke – rehme – hez! – ay, hez bike!
 Çu devdostiyê nake evîna dilovan,
 Evîna bê dek û pîk li ciyekî dihêwirê, ne revok e,
 Bê Rûpoş e, bûktiyê nake – çilka zêrê buhagiran!
 Hoy! tu tîk de ya min be, – pê ve – pê ve – bibe ya min!
 Ew bejn û bal, ew erda şepal, ew çêja kurala a delal
 A evîne, ramûsana te, – ew dest, ew çavên ku zor ciwan in,
 Ew sîng û berê germ, çîlspî, bişemal, zozanê bêbalûpal, –
 Xwe – rewana xwe – tevî piyariya xwe, bide min hemûyan,
 Pîrîska pîrîskê texpîr meke, yan na ez ê bimirim,
 Yan ji dibe ku nemirim, bibim bendeyê te yê dêran,
 Li nava mîja korewariya bêxêr, guh nedêrin,
 Mexsed û mirazên jiyandê – kam û heza zêhna min
 Winda bike bayê xwe yê dijwar, kor be bengîniya min!

Sone**Bo Çemê Nîl**

Hoy kurê çiyayê heyvê yên kal î Efrîqayî!
 Serdarê Ehraman û Cîrnîsan!
 Em te berdar dizanin, tam wê gavê, dîsan,
 Beyabanek dadigire dîringa binayîya me, ya navxweyî;
 Hoy nêrevanê neteweyên qemerî ji qal û belayê de,
 Tu bi wî çendî berdar î? yan tu dikevi binê
 Yên wisa ku te rûmetdar bikin? yên ji kêferatê, yên hanê,
 Jihalketî, sekîni bo maweyêkê di navbera
 Qahîre û Decanê de?
 Lo belkî şeydayiyên razbar biaxifîlin! teqez dixafîlin her;
 Ew nezani ye, ya ku çêdike dêrîseke beji
 Ya hov a dirinde, tu yî hûr hûr xunavê dibarîni ser
 Kanizilên hêşîn mîna robarên me, û tu çêje werdigirî ji
 Ji kewa berbangê ya kaw, te navrokên hêşîn ji hene li ber,
 Bi wî çendî ji bi şadî ber bi deryayê ve dixarî ji.

Sone**Ku Min Cara Pêşîn Çav Li Homerosê Chapman Gerand**

Min li gelek welatên zêrîn kir ger û geryan,
 Gelek dewlet û şahînahên 'ezîm dîm;
 Li derdora gelek dorgeyên rojava hêwirim,
 Ku tê de dengbêjên dilsoz li ber Apollo digeriyan.
 Zor caran ji min re salixê asiwana balûpal dan,
 Li kê derê Homerosê dûrebîn fermanrewa bû;
 Belam min çu carî berzîtiya wê ya xwerû hilnemêtibû
 Ta ku min bihîst şûrê şora Chapman da olan:
 Paşê min xwe fena yekî çavnêrê esmanan seh kir
 Wek gava ku bikîşe biçê nava dimena xwe felekeke nû;
 Yan ji nola Cortezê dilêr, gava ku xwe eylokî kir
 Û awir kuta Pasîfikê – û peyayên wî hemû
 Li hev û din nihêrîn li ramaneke har û dirr –
 Li ser lûtkeye li Darienê, bê deng û beng hemû.

Rezbera 1816'an**Sone****Ku min rûnişt Şah Lear careke din xwend**

Hey Serpêhatiya zimanê wê zêrîn, saza wê asûde!
 Syrena kîmşîkbedew, Keybanûya diyarên dûr!
 Berde sazîkirina awaza li ser vî roja sar û sur,
 Bigire devê rûpelên xwe yên kevnar, kerr û mit be, de:
 Bi xatirê te! lew min divê careke din li ber berhevdana dijwar
 A li navbera malkambaxiyê û gewdeyê bi çox û perox
 Bisojim sertaser; careke dîtir hê bi nefsbîçûkîtir, bi xuroş
 Dawêşînim tehleşêrîniya wê fêçîya Shakespearewar:
 Lo Helbestkarê Pêşeng! û hûn ewrên Albionê,
 Bavê û makên babeta me ya şax û dax dayî û nemir!
 Dema ku min xwe berda nava Daristana berûyên pîr a hanê,
 Ez sergerdan nebim di xewneke bêber de, li min nekîn xedîr,
 Lê, eger hat û agir ez sotim û tev kirim xwelî û arî,
 Baskên nû yên Sîmir bidin min ku dadim jiyana xwe bi harî.

Rêbendana 1818'an

(...)

Gundo

Wexta qêrîn, orîn û qirçên
tevlîhev dibûn, jî li wir bûm
Ne ku min nedibinist qêrîna te
Ne dişewitîm bi feryada te
Min bi hewarî hewar kir
Raxist ezman ber piyê te
Çavên agir rijand
Kefa destê xewna te
Bi dehlîa bagerê
Pêlda hewara roja te

Serkan Brûsk

